# Roman

# Sîlav

# Û

# Mêrên wê

(te ez fêrî evînê kirim)

Hesen îbrahîm

— Kevalê bergî: Fehmî balayî–Gelerîya dihok

— Derhênana hunerî: Govend umer

— Tîraj:

— Jimara spardinê:

## Mêvanê bejna bilind

Şev dirêj bû, bi dawî ne hat. ew jora cihê wî lê, ya bûye zîndan.

ew oksîcîna berî bêhnekê, sîhên wî geş dikirin. Nihu ya bûye jehir.

— Şev dirêj bû, sebira min nahêt.

Wêneyê wê, bi kiras û fîstanên bûkanîyê di nav perwazeyekê zer, di komodîna jora rûniştinêda bû. Kenîya wê, perwazeyên xwe şkandîne.

— ey hewar... Tu çend ciwanî? Tu çend nazik û şirînî?

Tarîya şevê neşêt ronahya çavên te kiz bikit.

Wêneyê wê, da ber sîngê xwe. Çavên xwe neqandin. Bêhna wî teng bû. hest bi henaseyên wê kir. Li pişt xwe zivirî.

— eve cihê wê bû. iha li vê derê rûniştbû. eve şûn zendên wêne .eve şûn tilên wêne .iha pişta xwe da bû vê derê...

Axxx, bêhna wê tijî jorêye. Kenîya wê tijî bi van dîwaranveye!

Min têr nedît. Min têr ne axavit. Min çu xweşî bi kenîya wê nebir. hindekên dî beşdarîya min dikirn. ew xweşî ne bo min bi tinê bû.

ez jê têr nabim, kengî dê bite roj? Kengî dê bînime ve?

Wêne bilind kire ber çavên xwe:

— Kengî? Kengî?

ew çend roj bûn karê xwe dikir, ka dê çawa li beranberî wê rawestit?! Ka dê çi bêjitê? Ka dê çawa çite destî? Ka dê çend destê wê mînte di destîda?

Gelek caran, beranberî xwedîkê, pirove dikirin. Dida bersîngê xwe, rûyên wê maçî dikirin. Di nav sîngê xweda digivaşt.

Li roja dîtinê, li roja ketîye beranberî çavên wê. Dergeh vebû. hemû tişt ji bîrkirin. Çu li bîrê nema, kes li pêş çavan nema. Kete beranberî bejna wê ya caran. her ew bejne ,her ew dêmê tijî hîvîye .her ew nêrgiza geşa carane. Çavên wî ketine çavên wê yên tijî kil. Wek megnatîsî kêşane xwe .hêşta mêyatî jê dizêt. Birûyên wê wek du kivanan tîr jê dipeşin. Şerê cîhanê dikin. Lêvên wê kanîya evîndaraye.

Befira elmanîya hindek ji spîyatîya xwe, bo rüyên wê kirîye dîyarî.

her ew mêkewa carane ,her sîngê wê yê har, li berahya wê direqist. hêşta ew coka di nîva memkên wêda, ewa gelek tolaz pê dîn kirîn. hêşta xuhdayne.!

Ne mêrê xirab, û ne salên xerîbîya dijwar şîyayne şûntilên xwe li dêmê wê yê mê dîyarbikin.

Destê xwe, bêy ageh ji xwe hebit, kire di destîda.

Nezanî çawa silav kir. Nezanî çawa bersiv da. Çavên wî ji lêvên wê venebûn.

Destê xwe ji nav destê wî kêşa der. Wî divîya destê wê gelek di destîda bimînit, divîya çavzlkanê li gel wan çavên belek bikit. Divîya têr bêhna wê hilbikêşt.

ew ya bi lez bû, destê wî zû berda.

— hûn gelek bi xêr hatin.

Wek mendehoşan, nezanî dê çi bikit, dê çi bêjit.

hevalê wî milê wî girt, bire di jora mêvananve.

— Supas... Biçûk çawanin?

— Keremkin.. Gelek başin, supas.

Çavên wî ji çavên wê venabin. Çu suhbet û axiftin jê nahêtin

her wekû li ser komeka pelan rûniştî. Gelek caran, karê xwe dikir, da suhbetekê bikit, neşîya. Divîya gelek pirsan bikit, neşîya. Divîya xwe di nav pirça wêda veşêrt, neşîya. Divîya xwe pavête ser sîngê wê yê har, neşîya. Bêhna wî teng bû. her çendekê di nav hizirên xweda berze dibû.

Pêlên kenîya wê ya tijî hêroyîn. Gehên mejîyê wî diazirandin. Livîn û hatin û çona wê hêza dilê wî dijwar dikir.

Li hindav serî rawestîya...

Bejna xwe ya bilind çemand, her du memkên wê girêl bûne ber derê kirasê wê yê kurt, ewê ji bin penteronê kabûy derketî. Li gel livînên wê yên har. Navika wê û kemaxên wê, wek befira serê çîya dîyar dikirin. Bi tilên xwe yên nazik, peyaleya çayê dana bersîngê wî.

— Keremke.

-.....

Peyaleya çayê bilind kire ber devê xwe, du qurç lêdan û dana cihê wê.

— Bibore kak... Min şekir nekiryê.

hevalê wî derdê wî dizanit.

— Jê bigere ,ew çayê, tal vedxut.

Şev dirêj bû...

— Şeva hewe xweş.

— hêşta zûye, xewa min nahêt.

— Direnge, sube me kar heye, dê biçûk çine xwandingehê.

Şev bi dawî nahêt. Xew sil bû.

— eve çend sale ez li hîvîya vê şevê me. Min Mirad bû ji nêzîk bibînim. Min Mirad bû, li gel rûnim. Nihu di navbera min û wêda, ev dîwareye. Dîwarê berlîn herfandin. Dê kengî vî dîwarî herêfin? Dengê dilê wê tijî guhên mine. Dengê guhnêlîya wê dibin mêrê pîs ve. Mejiyê min hêra. Bêhna wê ez ser xweş kirim. Çi bikim? ey hewar ?!

Dê kengî bite roj? Dê kengî ev dîware rabit? Dê kengî vî dergehî vekit û bêjite min spêde baş?

Çi bikim? Biçime jora wê? Xwe berdme di nav nivînên wêda?

Xew dirindeyekê hare. Leşê wî yê wastîyay dagîr kir. Di nav pêlên xwe yên harda bire xwarê ...

ew dîwarê di navbera wanda, bû şûşe. Leşê wê yê wek masîyê, di ber bejna mêrîda dirêj kirîye. Xirxira mêrî, xew jê sil kirîye.

Destê xwe li dîwarê şûşey da. Çavên wan ketine êk.

— Were... Xewa min jî nahêt.

Dergeh vebû. Sîlav bi cilkên şevê yên nîv rûs, hilda jor.

Divîya ji pêşve rabit.

— Ranebe. Xewa min jî nahêt. Dê hêlî di nav nivîna te da binivim ?!

Deng jê nehat, çavên wî bersiv dan.

Lihêfa wî rakir,cihê xwe li ber tenişta wî kir. Germa leşê wê, hestên wî yên nêr hişîyar kirin. Çavên wan ketin êk, lêvên wan ketin serêk. Bêhina sîngê wê tijî mejyê wî bû.

Destên wan bûne destên robotan. Kitkte, cilkên êk havêtine bin pên xwe.

Du leşên rûs, di xuhêra ter bûn. Dengê şerê evîna wan, livîn û bizava wan. Mêrê wastîyay, li jora dî hişîyar kir.

Li hindav serê wan rawestîya. Berî daxwaza lêburînê jê bikin.

Dengê biçûkan ji wê xewa xweş û bi tirs hişîyar kir.

Mal tijî denge, sîlav karê biçûka dikit, da biçine xwandingehê.

Rast rabû ser xwe. Birîyar da vê spêdeyê, ji xwe, nekit. Dibit êdî neşêt hosa ji nêzîk bibînit.

Dengê sîlavê ji jora xwarnê hat.

— Mirad, heker te biçûk birine xwandingehê, bo me hindek nanî û pêxwarinan di gel xwe bîne.

Dilê wî zêde xwe quta. Jîyê wî bû çarde sal. Neşîya xwe di nav nivînên xweda bigirt.

— Dê bi tinê mînit.ez û ew.eve roja mine. Dê hilo, ewa eve çend sale tu lihîvîyê, nihu bi tinêye, li benda te ye, qebê te dixwazit. Dê hilo xweşmêr. Dengê girtina dergehî, xwîna dilê wî lezand. Serê xwe ji jora xwe înader. Bejna zirav di jora xwarnê veye, şewqê didit.

Wek dizan, xwe nêzîk kir. Nevîya wî dîmenê gelek ciwan û şirîn têk bidit. Nevîya pirça wê ya tarî ji wê dîlana li ser milan dikit, bêbar bikit.

Lê wek pelatînka aşiqa ronahîyê, neşîya xwe. Divîya di nav pêlên agirê bejna wêda, xwe bisojit.

Çi bibit bila bibit, tinê ji vê xwekujtinê bêbar nebit.

— Sîlav, sîlav..

Bi tirseka şermîn li ser milê xwe zivirî.

— Keremke kak hewar? Spêde baş.

— Spêde baştir. Mirad ço derê?

— Belê. Ço biçûka bibite xwandingehê. Dê zû êt, te xêr bû?!

— Bibore ,ez şevêdî nenivîstîme.

— Wey tu bi xwedê kî?! Cihê te nexweş bû?

— Ne ne. Dilê min nexweş bû.

— Dilê te?!

— erê. Sîlav dilê min nexweş bû. Sîlava min. Te ez jibîr kirim?

— Bibore kak hewar, ez di te negehştim?! ez niza...

Destê wê girt, divîya danite ser dilê xwe. Zû destê xwe ji nav destê wî îna der.

— Zehmet nebit, xwe dûr bike, nihu dê mêrê min êt û...

— Mêrê te ...ez baş dinîyasim û tu jî wî baş dinîyasî.

— Bibore. Zehmet nebit here di jora xweve.

— ez ne hatîme binivim û bixum. ez ji ber te hatîme .eve çend sale ,ez li rojeka hosa digerim. ez li te digerim. Tu li min berze bûbûy. Min tu dîtî. ez bi sanahî te bernadim. Dê gîyanê xwe gorî te bikim.

- ez ditênagehim tu çi dibêjî?! Min ageh ji te nîne. Bela xwe ji min veke .ez neya wan karame. Tu şaşî.

— Sîlav., dilê min, ez nehatîme bi zorî yan bi pare yan bi hindek rêyên necwan vê daxwazê ji te bikim! ez daxwaza evîneka paqij ji te dikim. Baş bizane ,her tiştê te nevêt, her tiştê ne bi dilê tebit, ez nakim û bi mirina mine.

— ez h1ivîdarim dûr bikevî. Nihu dê Mirad êt. Bila me hosa nebînit.

— Tinê min divêt destên te bigirim. Destê te danime ser dilê xwe. Te bidime ber sîngê xwe . ez gelek ji te xerîb bûyme.

— Bibore .ewa te divêt, ez neşêm bikim, ew ne karê mine.

— Sîlav.: Baş bizane min xirabîya te nevêt, tinê ez neşêm bê te bijîm.

— Ma tu min û halê min nabînî?! Mêr û biçûk û...

- mêrê te pîvazekê naînit.

— Û biçûk û xelik û.?

- kesê ageh ji me nîne. Ma carekê xelkê pirsa halê te kirîye?

— ez neşêm, ji min bigere.

- ez jî neşêm bê te bijîm.

— Te mal heye, te biçûk hene.

— Min tinê tu divêy. Min dilê te divêt. Min çavên te divên. Min kenî û keyfa te divêt. Min...

— Bibore .ez ne şêm. ez ne kiça çarde salî me .ez xwedan mal û mêr û biçûkim. Ma tu nizanî?

— Sîlav.: Tu baş dizanî ez çend hez ji te dikim. Tu baş dizanî tu bûye beşek ji jîyana min, tu di xwîna dilê min da, bûye vayros. ez neşêm xwe jê rizgar bikim.

— hêdî hêdî, te xêre? Min ageh ji te nîne .ez te baş nanîyasim. ez di nav xem û biçûkên xweda berze bûyme. Ma tu halê min nizanî?

— ez hemû tiştan ji jîyana te dizanim. ez malbaba te û ya mêrê te jî baş dinîyasim, lewma dilê min bite sot. Lewma min divêt te ji nav destên wan rizgar bikim.

— Ma ez çi bikim? eveye bextê min ji dinîyayê.

— Bextê min jî ji dinîyayê, ez neşêm bê te bijîm.

— Bibore, min demê van gotinan nîne. Jîyana min hemû xem û nexweşîne .ez neşêm hindekên dî jî, li xwe zêde bikim.

— ez ji ber wan xem ü nexweşîyan, xwe gorî te dikim. Min divêt barê te sivik bikim. Xemên te sist bikim. Tu hest bi jîyanê bikî, bikenî, bijî, bi hîvîbî bî. Tu bo kê xwe disojî? Tu bo kê van xeman hildigirî?

— Tu çi ji halê min nizanî, ez mirîme!

— Dilê xwe vebke, bawerîya xwe bi min bîne. Bo min, ji dil baxive, dê dilê te tenabit.

— Piştî çi?

— Ma çi çoye ?hêşta tu wek bûkekêy.

Bişkurî, divîya bikenit. Berê xwe da dergehî.

— Supas bo van gotinan. ez ne li hîvîya çu xweşîya me.

— Were da pêkve van çend salên ji jîyê me mayîn, bi xweşî biborînin.

— ez neşêm, çîroka min dirêje.

— Çîroka xwe bo min bibêje da bikime roman. Ma tu nizanî ez romannivîsim?!

Kenî, kenîyek bi tirs û şermîn. Hezên wî yên nêr harkirin.

— Bawer bike dê bite dirêjtirîn û nexweştirîn roman.

— Bila, da evîndarên piştî me bo xwe mifay jê werbgirin.

— Belaya xwe ji min vebike. Ya te divêt, ez neşêm bikim.

— Tinê min kenîya te divêt.

Cih jitlîlîyên kenîyê pir bû, evê carê ji dil kenî û her bi kenîve got:

— heker tinê ya te divêt kenî bit, ew bi sanahye.

— Tinê min kenî ji te vêt. Lê divêt ew kenî ji dilê te derkevit.

Serê xwe hejand, axînkek ji kûratîya dilî derket.

— ew zehmete. Dilê min ji xeman pire. Kenîya min, tinê ji devîye.

— Dilê xwe vebike, bila xem derkevin, keyf û xweşî cihê xem û nexweşîyan bigirin.

Berê xwe da navçavên wî, tirsa wê verevî. Xwe pitir nêzîk kir.

— Nuke te çi ji min divît?

— Min dilê te divêt, min kenîya te divêt, min çavên te yên reş divên, min...

— Wey babo! Pa te çi bo mêrê min hêla?

— Pêkên votkayê û hevalên wî yên wekü wî.

— eve nesîbê mine, eve bara mine ji dinîyayê.

— Wenebêje .ez nesîbê teme, dilê min bara teye.

— ez neşêm, li min bibore. Tu bira û hevalekê xweştivîy.

— Min jî her hind divêt. Min ew bawerî divêt. Da ez bişêm te ji vê bêomêdîya tu têda derbêxim. Jîyan hêşta li pêşîya te û...

— Jîyana çi? Halê çi? ez pîrbûm, min çu nemaye bo bijîm.

— Wene bêje. Tu di koka gencatîya xwedayî. Tu hemû hêz û jîyanî.

— Tu nizanî çi hatîye serê min.

— Min divêt bizanim. Bo min bibêje, da tu jî tena bibî û da bikime roman wek min gotî.

Dîsan kenî, pitir bawerî peyda bû, tirsa wê nema, suhbeta wan xweştirbû.

— Tu rast dibêjî, dê jîyana min kîye roman?!

— erê û baştirîn roman.

— Dê hema dest pê bike.

Tijî navçavan keyf û h1ivîbûn.

— Navê wê bikime çi?

Pişta xwe dayê, bi kenîyek şermîn ve:

— Bike sîlav..

— Sîlav.?! Navê te?!

— erê navê min. Ma ne xweş nave?

— Gelek xweş nave û...

— Lê hişîyar be!

— Netirse.

— Tirs? Ma min çi maye jê bitirsim?

Destên xwe perxandin, her wekû qirêja çend salan jê didite bay.

— Divêt tu harî min bikî.

— Çawa?

— hindek ji jîyana xwe ya biçûkatîyê, hindek tiştên veşartî, hindek ji evîna xwe ya jîyê herzekarîyê.

— Tu hemû tiştan ji min dizanî, wek te gotî. Min çu tiştên veşartî nînin.

— Û evînî?!

— Bawer bike min evînî nekirîye.

— ez bawer nakim. ev ciwanîye û ev xwîna şirîn, şîya bin te ji evînîyê bidizin û...

Nehêla axivtina xwe xilas bikit:

— Raste û supas bo çavên te. Tu min wesa dibînî. Lê ez ne gehiştim evînîyê bikim. Min ew dem ne dît.

— Dê were da nihu bikin.

— Nihu?!

Kenîya wê tuxîb bezandin, gehên leşê wî harkirin.

— erê nihu. Min jî evînî nekirîye .em dê ji evro pêve dest pê bikin.

— Piştî sê biçûk û du mêran?! Dê evînîya çi bikim? Tu yarîyan bi min dikî?!

— Min jî jin û sê biçûk hene .ez jî wek teme.

— Gelek zehmete.

— Gelek bi sanahye.

## Kenîya sîlavê

Bajêr, biçûke, rengê gundan didit. Cadeya serekî, dilê bajêrî dikite du ker.

hindek dikanên bêseruber, lêvên cadeyê kirêtkirîne .her kesê carekê vî bajêrî bibînit, dê bêjit: ev bajêre ji bermaykên şerekê mezine .hêşta xanîyên wan, yên serdemê gencatîya wanin.

Li bajêrî hemûyê, du sê xanîyên bûyaxkirî nînin. hemû li hîvîya birîyareka taybetin, da bajêr serubin bikit, kolkên wan bikite bêlayên mermerî.

Hukmeta berê nedihêla kes ji kevlojankê xwe derbikevit. Li azadîya evro paxlên wan divalane. Tinê dişên nanê rojane peyda bikin.

Ji ber biçûkatîya bajêrî, xelkê wê, hêşta xwe wek gundîyan dihjmêrt. hemû, baş ya nîva mala êk dizanin.

Li vî bajêrî, kes neşêt çu nihênîyan veşêrt. Kes neşêt, xwarinek xweş bêy cîranan bixut.

Bajêr hişke. Darubar lê şîn nabit. Ne kanyeke, ne rûbareke, ne çem ne bîstanin.

Ji hişkatîya bajêrî, ji bê avîya wî, ji nebûna cihên taybet, tolazên wî li ser lêva cadeyê, wek polîsên zêrevanîyê, çavzilkanê di gel ebareşan dikin.

ew sê çar mizgevet, ew sê çar çayxane û sê çar baregayên partîyên sîyasî, neşên gîyanê wan yê pirbizav têr bikin. Karê rojê dikin, bi şev li ber televzyon û dengubasên dubare dixun.

Li roja dî li hîvîya ebareşekê dimînin, heta carekê kenîyeka zer ji lêvên êkê bibînin û bikevte davên wan yên pêtî.

Tinê çend kiçekan, xwe gorî pêlên pêşketinê kirîne. Şîyayne wî ebayê reş pavêjin, bejnên xwe yên zirav bidine bayê lekulomeyên dinîyayê.

Lê hêşta kesê ji wan kiça, ew dil û ew cerg nebûye û neşîyaye li nîva bazarê biçûk û bêseruber, kenîyeka şêtane, wan tolazan har û dîn bikit!

Kes nema li ser hişên xwe, kes nema li dor xwe nezivirî, kes nema ew karê di destîda nehêlaye bi rêve, kes nema gehên leşê wî nêrnebûyîn, kes nema dev lê beş nebûy.

Berê hemûyan kete cihê kenî jê zay, cihê wehî jê hatîye xwar.

eve bajêrê nêraye. Bîra kesê nahêt, li vî cihî û li vî demê rojê, guh li kenîyeka hosa bûy!

Gelek ji wan dikandaran, di nav kevnehizirên xweda gerîyan, gelek birne rojên xweş. Gelek di nav wan kevnehiziranda ketin di zivroka evînîyêda, ketin ber sîngê xweştivîyên xwe. Gelek jî birine ser kelexên kiçên wan, xüşkên wan, jinên wan, ewên sera kenîyeka hosa, di gel yarê xwe, di gel cîranê xwe, binax kirîn, bê ku kes dadgeha wan bikit, bê ku kes li egeran bigert !

Qepqepka wê, hemû hizir şirr kirin, hemû livîn rawestandin, hemû wek peykeran bê gîyan man.

Wek bûka baranê, demê biçûk lê kom dibin û li dorên wê direqsin û stranan bi bejna wê dibêjin, tolaz, birbire, li doran kom bûn.

Serinca wê kêşan, çenda mê bû, xwe pitir lê kir. Çenda nazik û şirîn bû, xwe kire hingivîn.

Çavên wê yên tijî kil, dilê wan tolazan bi tîrên xwe kunkirin. Wek xwepêşandanê, hemû heta derê mala wê di gel çon.

Wê şevê, hemû direng çone malên xwe. Wê şevê, xew neço çavên kesê. hemû mane hişîyar. Wê şevê, çu dizî li bajêrî nehatinekirin.

Wê şevê, kes nema di kelexê pîrejna xwe ne çerî. Wê şevê, çu tolaz neman kasêta mejîyê xwe bi dubarekirinêve hulî nekirî. Kes nema kenîya wê, di gel dengê qepqepka wê têkel nekirî. Kes nema çavên reş, li bersîngê xwe nenivandîn. Kes nema spêdeyê direng ji xew hişîyar nebûy. Kes nema mesînekê ava tezî li leşê xwe yê xuhday nekirî!

## Mizgînîyeka ji bîrkirî

— Tu dizanî, sîlav hatîye elmanîya?

ev gotine di serîda deng veda. Sîlav... Sîlav...

Bawer nekir. Wek hêbetîyan berê xwe da hevalê xwe.

— Çiye? Rengê te hosa hate guhrîn?

Cihê xwe xweş kir, guhên xwe, baş vekirin.

— Te çi got ?

hevalê wî, berê xwe jê da paş, nevîya enîya wî ya girê bibînit.

— Min got, sîlav hatîye elmanîya.

Rast rabû ser pêyan. Nevîya bawer bikit. Hizir kir, eve yarîyeka çivêle ,hevalê wî, demê xwe pê diborînit.

— Bibore kak hejar, min dil û mejîyê yarîyan nemaîye, bi taybet babetê sîlavê. Tu vê çendê baş dizanî.

— ez yarîyan nakim. Rojane du sê caran, ez zelamê wê dibînim. Mala wan bi rex malên meveye.

— Yarîyan neke... Tu baş dizanî, sîlav bo min çiye. Tu baş dizanî.

— eve telefona zelamê wêye .heker tu bawer nekî, hilo li ser kîsê min telefona wî bike.

Telefona xwe vekir. hejmarek lêda, telefon kire di destîda.

Xwe havête telefonê.

— Belê. Kerem bike .helo.

Devê wî beş bû. Neşîya bersiva wî bidit. Telefon berda.

— helo... helo.. hevalê wî zanî çi hate serî, telefon rakir.

— helo kak Mirad ezim, min divîya pirsa halê te bikim.

— Gelek supas... Tu li kîvey? eve du roje tu ne dîyarî?

— ez li mala biraderekê te yê xweştivî bûm, wî jî divêt silavekê li te bikit.

— Li ser çavan, bila kerem bikit, ka ew kîye?

Telefon kire di destîda û bi kenyeka fêlbazane dûrket.

— helo, kak Mirad, tu çawanî? hûn çawanin?

— em gelek başin. Tu çawanî? Bibore min tu nenîyasî, dîyare ez pîrbûyme.

— Nene, tu heqî. eve demekê dirêje me êkudu nedîtî. ez hewarim.

— Wey li serçavan kak hewar. Bawer bike ,hejar digot tu li van diray. Min gelek caran daxwaza telefona te jê dikir. Min divîya te bibînim.

— Mala min bo hewe vekirîye. Ê, ê.?

— Kerem bike, bibêje? Te divêt çi bibêjî?

— Supas, tinê min divîya bibêjim ku hûn hemû başin?!

Ser lê wermî. Çavên wî zîq bûn. Ageh ji çu nema. Nezanî çawa telefon dana. Nezanî çi gotê, nezanî li kûveye.

Sîlav hatîye elmanîya. Cîrana meye. Sê biçûk hene. Mêrê wê pûçe, bê pareye, bêserubere.

—aaaaaxxx sîlav. Bêhna te tijî difina min bû...

Sîlav… Sîlav. Dê li tana te êm. Dê xwe gehînime te. Dê xwe nêzîkî te kim.

— hê, te xêre tu hosa şirr bûy? Wî kabiray çi gote te?

— he, bibore kak hejar.

— Tu bibore, min nizanî navê sîlavê dê te hosa bêhiş kit!

— Divêt bi zûtirîn dem, ez sîlavê bibînim.

— Wey serçavan, lê...

— Lê çi?

— Mêrî wê, biçûkên wê.

— Tinê ji dûrve, tinê çavên wê yên reş bibînim, carê bese.

— Bi rastî, çavên wê mêrkujin.

— Te çi got?-min got, ser çavan.

# Jidîtina êkê

Şev ji nîvîyê borîye. Jor bêdenge, tarîye. Xew kabûsekê kirête. Mejî aloze, leş westyaye...

Li ser milê xwe zivirî, sîlav li ser textê wî rûniştîye. Şeyekê di destîda, pirça xwe şe dikit.

— Sîlav, sîlav. Were bi rex minve. Were ez bo te dîn û harbûm.

— hewar, ez jî bo te sotim. Were min bibe, were min rizgar bike. Were...

Livîn zêdebû. Gehên nêr harbûn.

— Sîlav, lêvên te çend şîrînin!

— hewar, yên te şîrîntirin.

Xuha leşê wî zêdebû. Lihêfa xwe pêça nav pêsîra xwe.

— Sîlav, sîlav, axx, sîngê te hêşta küvîye.

— Te ez xwarim. Min berde.

— ez ji te têr nabim.

— hêşta te çu nedîtîye.

— Ma tiştek ji van hinarên di devê minda xweştir hene?

Leşê xwe yê nazik û spî, li pêş çavan rûs kir. Wek zarvekereka şareza li dor kelexê wî yê xav hate çepa, heta hêrkirî. Xwe havête ser sîngê wî yê rûs, ketine gevizka evînê.

— eve ez bo te Mam. Dê vêca min ji dil bixwe û...

Dengê guhnêlîya wî zêdebû. Livîna wî zêdebû. Şerê wî di gel nivînên wî zêdebû.

— Sîlav, sîlav...

Destê jina wî, milê wî hejand.

— hewar, hewar, te xêre ? hilo, navê xwedê bîne?

Rast rabû ser xwe. Li dor xwe zivirî, sîlav nedît. Leşê wî yê ji xuhê terbûy. Destê xwe şor kire pêsîra xwe, zanî yê bûye zava. Qesta serşûyê kir. Wê şevê xew jê sil bû.

Li beranberî xwedîkê rûnişt. Dêmê wî yê pêtî, salên borî li pêş çavan rêz kirin.

Dengubasên wê tijî bajêrîne .her du tolaz digehine êk, behsê wê dikin. her du pîrejin lêk kom dibin, behsê wê dikin. Ya bûye benîştê hemû devan.

— Kes ji ciwanîya wê têr nabit. Xifşa xezalêye.

— Ne tinê ciwane, dibêjin gelek xwandeva û zanaye .

— Pa çawa xwelî pê werkirin, dane wî golkî?!

— Kes nizanit çawa pê razî bûye?!

— Nivştîyek bo xwelîserê çêkirin. Kî bo min bêjit, eve karê nivştîyane.

— Ne, ne. Çîroka wê ji nivştîyan meztire!

— Çiye?! Tu tiştekî dizanî? Dê ka bo me jî bibêje.

— ez bawer dikim bi zorî dayê.

--- ew çawa?!

-...

-...

Bêhina wî teng bû. Pêlên sermayê hişên wî komkirin.Leşê xwe pêça, qesta jora biçûkên xwe kir.

her sê biçûk, di nav pêlên xewêda berzebûyne. Zivirî jora xwe ya nivîstinê, jina wî, di xewek girandaye.

Li nîva jora rûniştinê, hatuço, heta westîyay. Telefzyon hel kir, ji vî kenalî bo yê dî. Çu bi dilî nebûn.

hiziran ser ji hemû hestan stand...

— Sîlav...

Wek xezalek küvî, li ser milê xwe zivirî. Tijî navçavan kenî û bişkurîne.

— Tu behsê min dikî?

— erê. Ma tu bawer dikî, ji bilî te, sîlavek dî di dinîyayêda hebit?!

Kenîya wê tijî kolanê bû. Tirsa wî zêde kir. Rengê wî ji şerma zerbû.

— Tu çend bi dilî.

— Û tu çend tirsinokî.

— ev kolane tijî mirovin.

— Ma te dîtîye mirovan mirov xwarîn?!

Bi kenîyek mê, bi rêveçonek hunerî, ber bi wîve hat.

— Kerem bike, te xêre?

Tirsa wî gehişte pûstê wî. Reng lê guhart. Paşive zivirî.

— ha ? Çinne, çinne.

Zanî ji mêranîyê xilas bû.

— Te gazî min kir ! Te got sîlav!

— Min? Ne ne. Min tinê divîya... Ê, ê...

— Çiye tu hosa lal bûy ? Te navê min îna. Te çi divêt bibêje, şerim neke?

— Çinne... Çinne.

— heker tu bûye mêr û tevîya tiştekî bibêjî. ez dê her livê kolanê êm û çim.

Tijî enîya wî xuh bû. hemû hêza xwe cemand, li rexên xwe zivirî.

— Min divîya bibêjim...

Li ser milê xwe zivirî, li hîvîya peyva wî ma.

— êêê... Kerem bike?

— Min divîya bibêjim... Tu... Tu gelek ciwan û şîrînî.

Kenîya wê hemû tuxîb bezandin.

— eve bû? Te ez hinde gîrokirim? Te divîya vê bibêjî?

— erê.

— Supas.

Dengê qepqepka wê guhên wî tijî mozîk kirin.

Li vî bajêrî, kes nemaye ne gotîyê, tu ciwanî, tu şîrînî, te ez sotim, te ez harkirim.

Li hemûyan Mirade bizanin, çawa şû bi vî xwîntehlî kirîye ? hemûyan Mirade bizanin, çawa bi vî hestîgiranî razî bûye?

# Nêrgiza ji nûgehiştî

— Jîyê min pazde sal bûn, ez di koka bizav û jîyanêda bûm. Ciwanî, zîrekî, saxlemî...

Dengê wê kiz bû, her wekû bi dest, wek radyoyê, kabika dengî hatîye badan.

— ez li pola sêyê navincî bûm.

Kete ser pişta xwe. Bişkurînê lêvên wê girtin. Berê wê kete asoyekê bê dawî.

— Min, ew tax û xwandingeh înabûne îşteîştê. Çu tolaz, li taxê me, nemabûn, min har û dîn nekirbin. Zelamên bi jin û biçûk, ji ber ciwanî û fêl û findên min, ne dihewyan.Yarên min roj bo rojê zêde dibûn.

Min, yarî bi wan dikirin. Demê xwe pê diborand. hevalên min yên kiç, hesûday bi min dibirin. Bawer bike, kesê ji wan tolazan, neşîya vî dilî dagîr bikit.

Berê xwe da navçavên wî:

— Te ageh ji min heye?

Serê xwe bilind kir, destê xwe havête pirça wê ya belav, li ser milên wê rast kir.

— erê, bibêje, min guh li teye.

— Û tu bawer dikî?!

Rast rabû ser xwe. Devê xwe havête lêva wê ya binî û zû berda.

— erê dilê min, ez bawer dikim. Ma kî ji te ciwantir û şîrîntir li vê dinîyayê heye?

Tijî navçavan bişkurîn û hîvî bûn.

— Bibêje, û paşî ?

Cihê xwe xweş kir. Milê xwe, baş, bi milê wî yê rûs ve şidand.

— ez, ji ber tolazan, ne dişîyam derkevim. ez nedşîyam biçime bazarî.

Xwe pitir bi leşê wîve şidand.

— ew keyf û yarî, li min bûne tirs. ez gelek ditirsîyam. Tirsa min her zêde dibû.

Bêy berê xwe bidite navçavên wê. Bêy ji cihê xwe bilivit:

— Tu ji çi ditirsîyay ? Ji kê ditirsîyay ?

— Ji bab û birayên xwe.

Xwe dirêjkire di ber tenîştê da.Sîngê xwe bi sîngê wîve na.Germa leşê wî, recifka dilê wê kêm kir.

— Şevekê...

Cih şirr bû, deng nema. Zanî ew xwenêzîkkirine, ji tirseka mezne. Ji nav hizirên xwe derket. Berê xwe da çavên wê yên tijî kil.

— êê?!

Zanî ya di nav destên dadwerekê adilda.

— Şevekê birayê min yê mezin, ji sükê dihat.

Guhên wî, li devê wê man, ew devê evîn jê dizêt.

— Wê şevê min neşîya xwe ji nav destên cîranê me bînimeder.

Germa leşê wî verevî. Qutana dilê wî zêdebû. hest bi kêmasîyê kir.

— Wê şevê, birayê min ez di koşa cîranê meda girtim.

Di gel pêlên xweşîyên ramûsana êkê ço xwarê.

— Lêvên min di nav lêvên wîda bûn. ez li berperên esmanan difirîm.

Min hest bi pêjina birayê xwe kir. Min hind dît. Pirça min, di nav destên wîdaye.

ez bipirçê rakêşam, ber bi malive birim.

Bêy lê bizivirt, her wekû ji wî karî razî:

— Û hevalê te? Çi lê hat? Çi kir?

— Ma dê çi kit?! Revî û ez di nav destên wî zalimîda hêlam.

Dil lê sot. Kêşa ber sîngê xwe. Pirça wê davdav bi tilên xwe şekir.Du sê maç li enîya wê dan.

— Bibêje, te dilê min heland, bibêje.

Çavên xwe neqandin. Axînkek kûr ji hinavên wê derket:

— Min nevêt ya dî bibêjim.

Destê xwe di nav sîngê wêda gêra, her wekû li tiştekî digert.

— Divêt tu bibêjî. Te soz daye min ku tu hemû tiştan bibêjî, dilê xwe vekî, paşmaykên reş ji bîrbikî. Bibêje. Da tu tena binivî.

Çavên xwe vekirin, êxistine çavên wî. Zanî rastîyê dibêjit. Zanî, jidil, divêt harî wê bikit. Piştrast bû, zanî hêşta mirovek heye, dişêt xemên xwe bo bibêjit. hest kir, bi gotina hemû nihênîyan dê dilê wê tena bit, dê şêt nivit. hest kir, dilek heye, dê harî dilê wê, xemên wê hilgirt.

Wê jî divîya hemû tiştan bibêjit. Wê jî divîya dilê xwe vala bikit. Wê jî divîya, wan rewşt û tîtalên kirêt, rûs û şermzar bikit. Wê jî divîya berevanîyê ji xwe bikit.

— Spêdeyê zû, birayê min û babê min ji mal derketin. ez hêlame di nav destên birayê biçûk û dayka bê deshelatda.

— Û xwandingeh?

Bi kenîyek sar:

— ez li hîvîya serbirînê bûm.Tu behsê xwandingehê dikî?!

hest bi rûdanek mezin kir.

— Piştî demekê kêm, di gel hemeyê zêringir û melayê taxê me û du zelamên dî hatine jor...

Rast rabû ser xwe, bi dengekê bilind:

— êêê?!

— Ê, ya dî tu baş dizanî.

— Ne ne, bextê te me ,hemûyê bibêje.

— Ma dê çi bibêjim?! Pirsên te ez hêr kirim.

Destên xwe bi serê xwe venan:

— Bêy min baxêvin,ez li hemeyê zêringir markirim.

— Ne ew bû ewê te digot hindî babê min bû?

— Bawer bike sê jîyên min hebûn. Mûyên serî spî bûbun. Birek biçûkan hebûn û du sê jin berdabûn.

— Wey hewar. hêşta kesên hosa di nav meda mayîne?! Û paşî?

— Min xwe nerazî kir. Xwe asê kir. Kire hewar. Çu guh ne simtin.

Bêhna wê lez kir. Xuh tijî navçavên wê bû. Berê xwe da binê jorê.

— Birayê min yê mezin digot: Te kuştin yan hemeyê zêringir?

Min bi dengê bilind digot: hizar caran kuştin, ne ew pîremêrê hîz û xwedan biçûk û jinên berday.

Dayka min nedihêla çu li min bikin. Ji şerma dinyayê û ji tirsa girtinê.ez hêlame sax.

Dayka min digot: Kiça min, heyamekê şû pê bike, soz bit, ez te jê bidime berdan û te bidime êkê bi nîva dilê te.

hiziran gîyanê her du wan mirand, deng û livîn ji kesê nehat.

— Çiye?! Tu nivîsitî?

Serê xwe hejand, du sê caran destê wê maçî kir. Bêhna wî nehat. Bi hemû hêza xwe, destê xwe li tenişta textî da.

— Çu nemaye ez dê ji xemên teda peqim. ez dê harbim.

— hêşta te guh li çu nebûye. eve êke ji sedê.

Rabû ser xwe, destên xwe havêtine rûyên wê yên ji befir ü xwînê:

— hêşta ji vê maztir bi serê te hatîye?!

— eve li ber hindekên dî çu nîne.

— Ka bibêje hey dilê min, çi tiştên ji vê kirêttir hatîne serê te.

— Binive dê wastî. Binive yan were li bermayîkên mêrên min biçere!

# Derdê mêrê pûç

Cihê teng, leşên wan yên rûs pitir pêkve nûsandîne .hindek caran, pêlên bayekê tezî, ji nav çeqên wan daran, wê xuha leşê wan zuha dikit.

Wek kevalekê surîyalî, di pişta turmbêlêda, xwe di êk alandîne. Piştî şereevîneka dijwar.

her dûyan alayên spî bilind kirîne.

— Tu nivîstî?

— ez di nav dilê teda helîyayme.

— Ma ne direnge?

- ji bo çi direnge?

— Demê hatina mêrê teye.

Bi kenîyek sivikve:

— Mêrê min?

— Bibore. Mêrî min û yê te.

Kenîya wê hêza leşê wî zêde kir.

— We nebêje .ew ji mêratîyê dûre.

— Çiye ? ez hest dikim tu bêumêd bûy ?

— heker ji ber te neba, ez da kime derê.

— Ne .em nihu pêdivî wîne.

Rast rabû serxwe. Dest da cilkên xwe, kirine berxwe. Navçavên wê bûne girê.

— Çi bû? Te guh li dengekî bû?

— Ne. Divêt em bizivirne mal.

— Nihu te tiştek dî digot? Çi bûye? Çi hate bîra te? Min tiştek nedurst got?

— Te ez tore kirim.

— Min? Min çi got? Min çi kir?

— Çune. Ji bîr bike.

— Ne .ez hosa bi sanahî ji bîr nakim û dêmê te yê tore li pêş çavên min. Ka bibêje min çi kir, min çi got, heta tu hosa reş û tal bûy.

— Te got...

— Ê? Min çi got?

— Te got, em nihu pêdivî Miradin.

— erê. Ma çi têdaye? Ma ne raste?

— Lê...

— Lê çi? ew ya di navbera meda baş dizanit û xwe şir dikit. heker te kire der. Dê me aşkira bikit. em neşên hosa azad di gel êk derkevin.

— Bes? evebû meremate?

— erê. eve merema mine. Pa ji berçavên wî yên reşe?!

— Bibore ,ez şaş têgheştim.

— Te çi hizir dikir?

— Çune. Ma em neçin?

— em naçin, heta tu ne bêjî ka tu çawa di axivtina min gheştî.

— Bextê teda, eve demekê dirêje min ji bîr kirî. Ne îne bîra min.

— Te soz daye min hemû kun ü qolaçên jîyana xwe bo min rohin bikî. Dilê xwe veke .ez hest dikim, gelek tişt mayne û te bo min negotîne. Dilê te hêşta hemû neyê mine.

— Min leşê xwe û gîyanê xwe dayîne te. Bawer bike ,eva min daye te ,her du mêrên min nedîtîye.

— Ne ,hêşta gelek nihênî mayîne. Dilê xwe baş vebike, da tu tenabî, da tu ji qeyda wan rizgar bibî.

— hê hê... ez çi xwelîyê bi serê xwe werbikim! Ya min dîtî, kes bawer nakit.

— ez dê bawer bikim. Bibêje.

— ez nizanim çawa dest pê bikim? Behsê kê ji wan bikim?

— Behsê her duwan. Lê nihu behsê vî bike.

Bêdeng bû, wek Mamostayeka şareza:

— Te çu caran pirsa xwe nekirîye ?eza bi mêr û biçûk. ez bo çi xwe dikime dibin teve? Te ne gotîye ,ev jine bênamûse, qehbeye, pûçe?

— Ne ne .ez dizanim tu bêxwedanî, bêmêrî. Zulim û zordarî li te hatîye kirin. Te kesê hejî xwe nîne.

— Mala te ava. Lê xelik we nabêjit.

— Bila xelik serê xwe li dîwaran bidit.

Bêhna wê teng bû. Nîşanên destbilindkirinê lê dîyar bûn.

— Ê, sîlava min. Bibêje, dilê xwe vebike.

Berê xwe, di pencereya turmbêlêra, da wê daristana xemlandî.

— Berî em bihêne elmanîya, piştî min şû bi Miradî kirî, ez hatme bajêrê hewe.

Bêdeng bû, herweku peşêman bûy, ew babete vekirî. Destê wê perxand, dana ser sîngê xwe yê rûs.

— ez hatim di nav maleka bîyanîda. hindek mirovên bîyanî. Min hest bi xerîbîyek mezin kir. Gelek caran min divîya birevim, bi dinîyayê bikevim.

Du sê rondik ketine ser rûyên wê yên sor.

Destê xwe havête gerdena wê. Bi lêvên xwe ew rondik vemalîn.

— Bibêje... Wê qirêjê jidlê xwe vemale.

— Rojekê...

Pişta xwe dayê, nevîya çavên wê, bi çavên wî bikevin. hest bi sîngê wî yê gerim kir.

— Rojekê, ez direng ji xew rabûm. Min dît du kuretolaz, ji jora jintîya min derketin. Rengê wan û seruberê wan dîyarbû ka çi divên û ka çi kirîne. Min neşîya xwe bigirim, bi taybet piştî min bi çavên xwe dîtî hindek pare kirîne di paxla xesûya minda, û bûye pistpsta wan. Min guh li xesûya xwe bû, digotê bêhna xwe fireh bikin, hêşta bûke, ma dê kûve biçit? her bo heweye.

— ey hewar eve jî bi serê te hatîye?!

— Û hêşta û hêşta te çu nedîtîye!

— Ka bibêje, zûbe te dilê min peqand.

— Min neşîya xwe. Êvarî Mirad hate mal, min ew suhbet bo kir.

— Ê?

— herwekî min bo dîwarî kirî.

--- çi got? Çi kir?!

— Got, te şol ji kesê nîne .heker ne bi dilê te bit, kes zorîyê li te nakit.

— Tu bi xwedêkî we got?!

— erê û êkser nivîst.

— Û paşî?

— Min hizir kir, dê subehey dayka xwe yan mêrekî kujit yan heker çu nebit, ew suhbet dê mînte di navbera meda. Min nezanî spêdeyê zû ew suhbet hemû gehandîye dayka xwe.

— Wey qeda vê bikevin zelamo.

— Dayka wî hate jora me, bê ku silav bikit. Li hindav serê min rawestîya û got:

— Çiye tu xwe li ser serê me şerîf dikî? Ma em nizanin te çend gan dayîne, berî tu bêye di mala meda?! Da ez bo te bibêjim: Tu rojekê devê xwe vekî, ez dê tijî gû bikim û dê te li nîva cadeyê li ser piştê rabikêşim û çend tolazên vê kolanî, hemûya havême ser te, da baş serê te û malbaba te şor bikim da bo hemû dinîyayê dîyarbit, tu mazntirîn qehbey!

Dengê girîyê, ji axivtinên wê dihat. Bêdeng bû, wastîya, birînên wê yên kevin derbûn, tijî derê wan xwîn bû.

— Ji bîr bike .ez wê malê baş dinîyasim.

— Min gelek xwe parast. Min xwe diveşart. Mal wekî cobê lêhatbû. hemû heval bûn, dayk û bab û bira û xûşik. ew bi xwe ,ew jî heval bû.

— Nebêje ez ketim tora wan?

— Xwezî ez bi tinê ketbam tora wan.

Çavên xwe neqandin. Nevîya çavên wî bibînit. Bêhneka kûr hilkêşa:

— hevalekê wî, her dihate mala me. Gelek têkelîya me dikir. Gelek caran, em mêvan dikirin, ez nedçom. Min hest dikir ji ber mine. Rojekê em daxwaz kirine mala xwe. Min jî divîya ji wê girtîxaneyê derbikevim. Vê carê min tif kire pêsîra xwe û tif kire dayk ü babên xwe û bextê xwe yê reş. Min got, heker qehbetî bit, bila bi dilê min bit.

— Û tu çoy?

— Xwezî ez neçobam.

— Bo?

— Piştî xwarnê û çavexwarnê, ez, bi tinê, li pêş telefzyonê hêlam, ew çone jorên serî.

— Ma bê jin û biçûk bû?

— Jin û biçûkên xwe, ji mal birbûne derê, da bi dilê xwe bikevit.

— ê, te çi kir?

— Bêhina min teng bû. Min qesta jorên serî kir.

Neşîya baxivit, çavên xwe şorkirin.

— Bibêje, tu çi bibêjî ez bawer dikim!

— Min guh li dengê wan bû. Serê min wermî. Min bawer nekir, heta... heta...

— heta çi? Te guh li çi bû? Te çi dît?

— hişbe. Pirsên te ez hêrkirim.hişbe.

— Divêt tu bibêjî, da dilê te tena bit. Te çi dît?

— Min çi dît! Tu çi hizir dikî?!

— Jineka dî di koşa mêrê teda bû?

— Xwezî deh jin di koşa mêrê min da ban!

— Dê bibêje, pa te çi dît?

— Mêrê min di koşa hevalê xweda bû!

# Gera teye

— Çiye ? eve çend rojin hema tu xwe têr dikî û bêdeng dimînî. Piştî min hemû nihênîyên xwe aşkira kirîn, tu pirsan nakî?

— Ma te negot eve êk ji sedêye?

— Min gelek ji nihênîyên jîyana xwe bo te gotin. Te hêşta çu tişt bo min negotîye .evro gera teye. Tu dê xwe bo min rûs bikî.

— Ma ez ne rûsim? Baş berê xwe bide min!

— Min rûsatîya mejîyê te divêt, ya hizirên te, ya jîyana te. Ne ya leşê te yê pîs.

— Min çu tiştên hejî gotinê nînin.

— Divêt tu jî hemû berperên jîyana xwe bo min rohin bikî.

— Bila. Lê te gelek maye tu bo min bibêjî. Ji bîr neke.

— Ma te divêt tu çi bizanî?

— Şeva êkê. Şeva te çawa bû? Tu çawa bûye bûk? Tu çawa kirîye jin?

Xwe havête ser kelexê wî yê rûs û daber leq û mistan.

— Tu zelamekê hîzî... Ji çu têr nabî.

— Dîyare şeveka gelek xweş bû?!

— Ya mêrê êkê yan mêrê duyê?

— Ya mêrê êkê.

enîya wê bû girê. Di nav hiziranda berzebû. Xwe kire qurmik. Tirs nêzîkî dilê wê bû.

— Çu caran naête ji bîrkirin. Jîyana min hemû guhart.

— Wey babû. Dê ka bibêje, çi hate bîra te hosa rengê te hate guhorîn?

— erê, te divêt ez bibêjim da tu destperyê li ber bikî.

Kenîya wî ji dil derket. Cih tijî jîyan kir.

— Ma dê çawa destperyê bikim û ev ciwanîye li ber sîngê min?!

— Pa te çi merem pê heye ?eve deh caran te ev daxwaze ji min kir?

— ez bawer nakim, wî pîremêrî şîyabit, wê şevê, vê kara xezala pazde salî bikite jin?!

Kûr di nav hizirên xweda ço xwar. Hemeyê zêringir, li ber sîngê wê, doxwîna xwe vedikir, divîya birevit. Pişta wê bi sîngê wîve ma. Sîngê wî yê gerim zivirande ser hişên wê.

— Te rast got, wê şevê ez bi sanahî nebûme jin. Lê soz bit ez ne bibêjim heta tu şeva zavatîya xwe bo min nebêjî.

— Wey ser çavan. Dê bawerbikî heker min got?

— heker te rast got, ez dê bawerbikim.

— Ma tu çawa dizanî min rast got yan ne?

— Rengê te, çavên te, neşên direwan veşêrin.

— Wesa? Tu bawerdikî, ez ji dil hez ji te dikim?!

— Nexêr. Tu hez ji min nakî. em timamkerên êkin. ewa ji te kêm, ez didime te ,ewa min divêt tu didîye min. Lewma em dişên pêkive bijîn!

— Ne ne, bawerbike min tu jidil divêy.

— Çavên te we nabêjin. Ji suhbeta me nereve.

— Te çi divêt bizanî?

— ewa te ji min divêt bizanî.

— Çîroka min, gelek ji ya te cudaye.

— Dibit, lê ew tiştê we li te kirî, tu jin û biçûkên xwe ji bîr bikî û bi dû min bikevî.

— Ciwanîya te, çavên te, kenîya te...

— Direwan neke. Jina te, gelek ji min ciwan û şirîntire .ez bawer nakim çi jin çi mêr, heker li mala xwe têr bin, qesta cihekê dî bikin. Vêca bibêje ka egerên te çine? Û ji şeva zavatîya xwe dest pê bike.

— Çiye? Te jî divêt destperyê li ber şeva min bikî?

— Bo ne !?heker şeveka xweş bit, ez amade me.

Da ber sîngê xwe.

— ez hîzim yan tu?

— Xwe mijûl neke.

— Çi bo te bibêjim? Çi ji te veşêrim?

— Çi veneşêre. Wekî min, xwe rûs bike.

— hê hê. ez şerim dikim çîroka xwe bibêjim.

— Ma ji ya min xirabtire?

— Ne. Lê bo êkî wek min, şermzarîye.

— Dê ka bibêje, te çi qiphet kirîne?

Wekû pîremêrekê danemir, bo nevîyên xwe çîrokekê bibêjit, cihê xwe xweş kir.

— her ji roja bûna wê...

— Ê?

— Mala me di gel mala Mamê min pêkhatin ku bidine min.

— hêşta ev tişte li vî zemanî maye ?!

— erê, bo rûreşîya min, hêşta maye.

— Tu çawa razîbûy?

— ez biçûk bûm, min çu nedizanî.

— Û piştî hûn mezin bûyîn?

— em pêkve mezin bûn. Pêkve xwandin û pêkve jîyan. Roj bo rojê li pêş çavên min reş bû. her çende wek te gotî, ciwan û şirîn û xwandeva...

— Bila hewe birîyara xwe daba, piştî hûn mezin bûyîn.

— Babê wê zû mir, di nav mala meda ma. Babê min soz dabû birayê xwe. Neşîya lêve bibit. Min jî nevîya dilê wî bhêlim.

— Te dilê xwe heland, da dilê wî nehêlî?

— erê erê. Min xwe û ew gorî axivtineka berî bîst salan kir.

— Û wê? Serederîya wê çi bû?

— Wê ji dil hez ji min dikir. Lê...

— Lê çi?

— Piştî min rastî bo gotî, dilê wê jî çirmisî.

— Pa hûn çawa di gel êk dijîn? Jîyana hewe çawa diçite serî?

--- piştî biçûka, me çu pê çê nabit. Wek tu dibînî, nîveka demê xwe ez di gel te diborînim.

— Û ew? ew demê xwe çawa diborînit?

— Biçûk û karubarên malê, xemên wê sist dikin.

— Tu bibêjî jin bi van tiştan bi tinê dijît?

— ez mafê wê li ser xwe nahêlim.

— ez bawer dikim tu merema min dizanî û tu baş mafê jinê dizanî!

— Wek min gotîye te ,ez mafê wê ji bîr nakim.

Çavên her duwan, bi banê jorêve, man hilawîstî. hiziran ji nav çar dîwaran birine der.

***

Dengê deheol û zirnayê, tijî guhên wî bûn. Tilîlîyên kiçan, govend şarand. Li ber sîngê wî dû sê tolazan xwe dihilavêt. Di dûra, jin û kiçên xemlandî bi lewendîyên sor û zer, diketine çepan.

Destê birazavay, li ser milê wî yê rastê ye. Babê wî li rexê çepê devê wî beşe.

Birazavay, kitkte mêvan verevandin. Ce vala bû. Deng kêm bûn. Ronahî vemirandin.

Li ber dergehê jora wî, devê xwe bire bin guhî.

— Tu dizanî dê çi kî?

Serê xwe hejand. Şerim ji navçavan dibarî.

— Şerim neke .ew helala teye.

Pitir şermê rûyên wî sorkirin.

— Dê careka dî bo te bibêjim. heker tu tengav bûy, gazî min bike .ez dê li pişta derî li hîvîya te bim.

Xwe kire qurmik. Şerim tijî nav pûstê wî bû.

— Bibêje ê... Dê bi pê rastê çîye jor. Dê navê xwedê înî. Gelek li nik ne rûne. Dê xwe rûs bikî. Çu tiştan di ber xwe nahêlî. ew jî divêt xwe rûs bikit. Dê kevte ser piştê. her du pêyên wê jêkive bike. Navê xwedê bîne. Bi hemû hêza xwe bikêşe ber sîngê xwe...

Te zanî yan dîsa bibêjim?

— Min zanî, min zanî.

Derghe vekir. Palek pêrana, havête di jorve. Berî silav bikite dotmama xwe. Pêsîra xwe ter kirbû.

***

hest bi nêratîya wî kir. Ji nav hizirên wê hişîyar kir.

— Çiye? Te xêre hosa bêdeng bûy?

— ha? Çune çune .ez dûr çobûm.

— Dîyare ji wê xencera ha ha dê tenişta min kun kit.

Givaşte bersîngê xwe.

— Nereve. Dê her bibêjî ka te şeva zavatîya xwe çi kirîye?

Xwe havête ser sîngê wê yê rûs. Devê xwe havête lêvên wê yên ter.

— iha min ho kir.

Kenîya wan jor tijî bizav û jîyan kir.

# Ber bi xerîbîyek dî

— her ji heyva êkê, ez hatîme di wê malêda, min hest bi xerîbîyeka dijwar dikir. hemû tişt bo min dixerîb bûn.

Mêrê min, di ser bêdesthelatîya wîra, wek dojminê min bû. Xesûya min, wek polîseka bêdil serederî di gel min dikir. Birayên wî, xûşkên wî, li hîvîya ketina min bûn.

hemûyan divîyan ez xwe bi erzanî bifiroşim. ez xwe bi pîstê wan bigihorim.

ez kirasê wan bikime berxwe.

Rabû ser xwe, di nav wî gîyayê li ber lêva rêya di nav daristanêra diçit, li kulîlkekê gerîya.

Kulîlik bilindkire ber difina xwe.

— Min gelek berevanî ji xwe kir. Min gelek xwe asê kir. Min gelek xwe ragirt. ez wastîyam. ez bêhêz bûm.

Binemala mêrê min cobexaneye .eve hemû bo min nexem bû. Xema mina giran, xema pişta min şkandî, mêrê min qûndeh bit. Mêrê min, her roj di bin hevalekê xweda bit.

Bi rastî eve ji hêza min mezntire .ez neşîyam xwe li ber bigirim.

ew kulîlka didestîda, kire diberûka wîda û dûrket.

— Rojekê min birîyar da, xwe bidime berdanê. Min ji dil, kar bo berdana xwe kir. Min gote Mirad, divêt tu min ber bidî.

Bêdeng bû. Li xwe zivirî, hest bi harîkarîya wî kir.

— Birayê minê mezin, di hewara min hat. Min got, mala xwedê ava, hêşta ez bi xwedanim. Dê min ji vî kirasê pîs înte der.

Serê xwe şor kir, nevîya berdewam bit. hest bi şermê kir.

— Bibêje dilê min. Wesa dîyare, kesê hejî nîne tu nihênîyên wî veşêrî. Dilê xwe ji qirêja wan paqij bike.

Berê xwe da navçavên wî, zanî vê çarê direwa lê nakit. Zanî wî jî ji dil divêt dilê wê ji xeman vala bikit, ji qeyd û zincîrên her du mêran azad bikit.

— Çi bibêjim? Dilê min. Çi veşêrim? Min çîroka xwe û ya mala xesûya xwe du sê carî bo birayê xwe got. Li destpêkê dest da demanceya xwe. Min got dê evro du sê kesan ji mala mêrê min kite kelex.

— Ê? Paşî çi kir?

— Piştî xesûya min hatîye mal. Birayê min da bersîngê xwe û da ber maçan, bi germî bi xêrhatina wî kir. Bire di joreka dîve .ez nizanim çi bo got. ez nizanim çi pêve xwand.

Lê ya ez baş dizanim, wê şevê heta spêdeyê du jin li mala xesûya min, di ber tenişta birayê minda nivîstin!

— ey hewar... ev kare di nav mejîda hene?!

— erê, bawer bike, min bi çavên xwe dît.

— Û birayê te çawa razîbû?!

— ew jî nêre. Wek her nêrekî!

— Ê, ê? Bibêje te ez hêrkirim.

— Spêdeyê birayê min hate nik min û got:

Ji evro pêve, tu bi xirabî behsê vê malê bikî, ez dê te bi vê demancê bikujim. Netirse ,ez te xafil nakim. Dê her çend rojekan ême seredana te.

Destê xwe dana ser milê min û got, guhê xwe bide mêrî xwe.

Bi kenî û tilîlîve ,heta dergehê ji derve hemû di gel çon.

ew kaxeza ez pê dixwerîm, min ji dest da. ez Mam di nîva wanda hilawîstî.

Kes nema ez pê bixwerim. Kes nema ez penayê bibimê. her çend rojekan, birayê min û hevalên xwe, dibûne mêvanên me.

Girî, ji dil girîya. Dengê nesaxekê bêomêd ji girîya wê dihat.

— Min hemû tişt ji dest dan. Xwandin, paşeroj, tu çîroka mêrê min dizanî. Birayê min te nîyasî. ez Mam bêxwedan. ez ditirsîyam. Ji dil tirsîyam bikevme tora wan. Bikevme bin pêyên wan. Bibime qehpe. Bi şev, ez nedinivîstim, ji tirsa êk bi zorî bête di jora minda. Bi roj, min dergehê xwe digrt, kilîl dida. Xwarin û vexwarina min bi dizî bû. Destav û hatinuçona min bi dizî bû.

Dengê wê, awazên wastîyan û bêhêzîyê jê dihat.

— Berxwedana min sist bû. Min neşîya berevanîyê ji xwe bikim. Jîyana min di gel wan wek şerê man ü nemanê bû. Min xwe diparast. Wan jî berevanî ji jîyana xwe dikir. Wan hest dikir, ez dê hêlîna wan ya ava û nihênîyên wan têkdim. Min jî hest dikir, berdewamîya jîyanê di gel wan, dê min tûşî êşa wan bikit.

Çu ji min naêt. Bira û xweşmêrê min, di koşa jintîyên minda dinivit. Berdan nema. Kes min narevînit, ji bo azadkirina min. Xwekujtin, bi dest min nakevit.

Çend carekê min gazinde bo birayê xwe dikir, li min dixwerî û digot:

— Ma dê her roj bi berdana te ve bim. Duhî bû, te xwe ji mêrekî dayîye berdan. Vê suhbetê nekî, başe.

Gelek şevan heta spêdeyê ez dimam hişîyar. Gelek rojan, min xwarin nedidît. Tinê hizir dikirin. Tinê li rêyekê digerîyam, ka çi bikim? Çawa xwe ji vî halî rizgar bikim? Çawa xwe biparêzim? Gelek caran, min hizir dikir, çawa xwe bikujim?

ev zivroke, demekê dirêj di gel min ma. heta rojekê, ez li ser banî bûm, min xwe ji mêvana vedişart.

Kurê cîranê me, yê zirtolaz, hate hindav serê min, ez gelek jê tirsîyam. Wî bi kenîyeka ciwan û sade got:

— Netirse .ez çu li te nakim.

Min xwe vekêşa û berê xwe dayê ka dê çi bikit.

Wî suhbet vekir û got:

— ez baş dizanim tu di deravekê tengday. ev mala tu hatîyê, maleka bênamûs û bêşerefin. Wesa dîyare tu kiçeka başî.

ez pitir tirsîyam. Min pitir hest bi şerekê nihênî kir. Bo min dîyarbû, xelkê vî bajêrî hemû dizanin ka çi li vê malê rû didit.

Rûnişte ser bilokekî, berê xwe da navçavên min:

— heker tu di nav wanda bimînî, êşa wan, dê te jî girt.

ev gotine wek zengekê di serê minda deng vedda.

Min hest bi tenahîyê kir:

— Ma çi ji min dêt? ez neşêm çu bikim?

— Bireve .here, ji dervey welatî!

Tijî navçavên min hîvî bûn.

— Çawa?! Ji derveyî welatî?

— erê. heker te bivêt, ez dê te derbaz bikim. em dê pêkve çine derê dê...

ez lê xwerîm:

— Dîyare te jî wek wan meremek heye? Yan wan tu hinartî? Dê here dûr bikeve.

hejarî paşive ço û got:

— Tinê merema min, ev ciwanîye ne ête firotin.

Min qesta jora xwe kir. Dengê wî, di serê minda ma. here ji derve... Bireve... Ji dervey welatî...

Min ew gotin, kirine birîyar. ev birîyare ,ev pêngave, dê min ji xwekujtinê rizgar bikit, ji berku ez çu car hizira xwefirotinê nakim. Berdan jî nema, tinê li pêşîya min, xwekujtine yan ev birîyareye .ez dişêm li dervey welatî, li ser Miradî zal bibim, ez dişêm biguhorim. Li wê derê, hindek tiştên baş bikim, dê şêm kime mirov, kime mêr.

Bêdeng bû, wastîya, li ber tenişta darekê rawestîya. hiziran bilind kire berperên esmanan, hizir jorda hatine xwarê. Demê ji piştve kirîye di koşa xweda. hişik, pişta wê, bi sîngê xweve şidand. her destekê xwe havête memkekê wê. Devê xwe di nav pirça wêra havête binguharên wê.

hest bi tenahyeka bêdawî kir. Nevîya ji wê xewnê hişîyar bit. Nevîya dem bilivit. Nevîya ew şidandina bi sîngê wîve sist bibit. Ji dil divîya di gel leşê wî yê gerim, bibite êk parçe. Bibite êk leş û êk gîyan.

— Soz bit, ji evro pêve ,ez nehêlim tu çu nexweşîyan bibînî.

— Nihu, dilê min ne bi min veye. Dilê min yê bi jina teve. Te ew bo xatira min hêla, da xemên min sist bikî.

— Xema wê nexwe .ez wê, bi tinê, nahêlim. Dê xemên hewe herdûyan sist bikim.

Kenîya wê, hindek çûçik ji bin wan daran revandin.

Li dor xwe zivirî. Sîngê xwe bi sîngê wîve na.

— Te ez kirîme êxsîra xwe.

— Tu nîveka jîyana minî.

— Û nîva dî, jina teye mane?

— Bi bore. Ne tinê ew jina mine ,ew dotmama mine jî, dayka sê biçûkên mine jî.

— ez jî razî nabim, tu wê bêxwedan bihêlî. Pitir xwe bi sîngîve şidand.

— Tinê min divêt tu bizanî, ez ji dil pêdivî teme.

# Revîn ji rastîyê

— ez di ziviroka xemên xweda hêrbûbûm. Dinîya li pêş çavên min tarî bûbû. Min, heval ji bîrkirin. Min, kar nema. ez ketme beranberî rastîyeka tal.

ez berdewambûn û danpêdan bi jin û jîyana bo min hatîye helbijartin, yan pê li hemû rewşt û tîtalên bab ü kalan danim. Jina xwe, dotmama xwe, dayka biçûkê xwe yê di zikê daykê da, roj bo rojê mezin dibit. Bi sê telaqan berbidim. Û bab ü dayka xwe bi wan sê telaqan binax bikim ?!

Min gelek xwe ragirt. Min gelek xwe asê kir. Gelek şevan, heta spêdeyê, ez nedinivîstim. Gelek şevan, min hizira jinekê dikir. Gelek caran, li ber filmekê bîyanî, min vedresand. Û ew şengejna ciwan û nazik, li ber tenişta min ya nîv rûs bû.

ez gehiştim pileya xwekujtinê. Bibore, li welatê me, tinê jin xwe dikujin. Babê min, dayka min, kesukarên min, neşîyan êşa min bizanin. Min nedişîya derdê xwe bo kesê bibêjim.

ez di nav xweda dihelîyam. ez ne evîndarbûm. Ne ne. Min çu yar nebûn. Min hez ji çu kiçan nedikir.

Tinê min divîya, ewa bête ber dilê min, bi rêya evînê bêt. Bi rê û bi birîyara min û wê bit, ne bi birîyara babê min bit. Min divîya, ez û ew pêkve pilanan danin. Pêkve ji bo paşeroja xwe xebatê bikin. em pêkve cilkên bûk û zavanîya xwe jî bikirin. Pêkve navmalî û textê nivîstinê bikirin.

Êvarîyekê, ez zivirîme mal. Piştî ku çend rojekan, ez bi karekî çobûme hewlêrê. Min dît, mala me serubin bûye. Kes wek xwe nemaye. Çu tişt li cihê xwe nemayne.

her li derî, dayka min û xûşkên min, bi dehwat û tilîlî hatine pêşîya min. Birayên min, êk êke hatine serê min.

Berî ez rûnim û çu pirsan bikim, babê min gote birayê min, here wek min gotî û zû bizivire.

Birayê min, xwe ji ber tenişta min havête derê û qesta wî karî kir, ewê bo min, hêşta nedîyar.

Min çend caran vîya pirsê bikim, du sê pirs ji min hatine kirin û bersiva hindek pirsên dî hate dan. her ez mijûl dikirim.

heta mela di gel sê çar zelamekan dayn jor, hemû tişt bo min xûya bûn!

Bêhna xwe kûr hilkêşa. Serê xwe bilin dikir. Stêrka çavên xwe êxste hindek ewran.

— Roj bo rojê ew hejar li ber dilê min sar bû, reş bû. Min nedvîya bibînim.

Spêdeyê, ez diçome karî. Nîvşev dizivirîm mal. heta ew nenivîstiba, ez nedinivîstim. Gelek şeva, bi tinê di jora rûniştinêda dinivîstim. Gelek caran, li nik hevalan dinivîstim.

eve hemû nebû çare. Çare, dê dilê gelekan tijî xwîn kit. Dê gelek pirs ji bin ezmanê xwedana derkevin.

Min xwe gorî wê kir. Dibit, wê jî, xwe gorî min kirbit. Dibit hîvîyên wê, ji yên min mazntir bin.

Min neşîya xwe pitir li ber bigirim. Min birîyar da birevim, derkevim, xwe veşêrim.

— Bibore, û ew çawa gehişte te?

Bêhna xwe vekir. Serê xwe şorkir.

— Çîrok dirêje.

Wek tolvekirinekê, didilê xweda digot, te gelek caran gotîye min:

— Bibêje. Ma me çi heye? Ma çi li hîvîya meye? Bibêje.

Berê xwe da navçavên wê, hesta serkevtinê li nik dît. Wê jî divîya hindek hebin wek wê tûşî nexweşîyan bûbin. Wê jî divîya mayê xwe di hemû xweşî û nexweşîyên wî bikit.

— Rojekê, hêşta tu bûk bûy...

— Çi? ez?

— erê, ew çend rojek bûn, tu hatibûy hişkebajêrê me.

--- ê ê?

— Tu di gel xûşka Mirad hatbûy sûkê. Te ew bajêr û sûk înabûne îşteîştê.

Kenîya wê awazên herzekarîyê jê dihatin. Lê zû xeman dêmê wê girt.

— ez hêşta bi omêd bûm. hêşta min çu nedzanî. ez ji girtîxaneyê rizgar bûbûm.

Berê xwe da navçavên wî.

— Neku ez hingê ketbûme dilê te?!

— Demê te ew kenîya har li wê sûka nêr berday.

— hey gawir. eve çend sale te bûseya xwe li ber min veday. Tu ranewestîyay, heta ez ketîme davên te. heta te ez êxsîr kirîm.

Xwe havête ber sîngê wî ü givaşt.

— Li bîra teye, demê cara êkê min navê te înay?

— Ne. Ne li bîra mine. Ka bibêje çawabû ?!

— Navê te ketibû ser zarê hemû tolazan. Bûbû benîştê hemû devan.

— Wey hewar! Ma ez çi bûm?

— Tu ciwantirîn û şirîntirîn û naziktirîn û...

— Bese bese .ez dê bawer kim.

— Bawer bike. Te ew bajêr mê kiribû.

— Ê? Ka bibêje çawa cara êkê me êkudu axavit?

— Min neşîya xwe, min gazî te kir.

— Û başî?

— Te got. Keremke? Te xêre?

Berê xwe da navçavên wî, zanî rastîyê dibêjit.

— ez ji şerman hişik bûm.

— Ê?

— Çu axivtin ji min nehat. Rengê min zer bû. Te her digot te xêr bû, te navê min înay.

Min ji şerma got, çune çune.

— ev rûdane, ne li bîra mine.

— Te got, heker tu bûye mêr û te zanî dê çi bêjîye min.ez her di van kolanara diêm û diçim.

— Wey tu bi xwedêkî?! Min we got?

— erê. ew xwîna mayîye di leşê min, te ew jî hişik kir.

— Bibore dilê min. Min nezanî xwîna te hinde şirîne.

— Min jî xwe kire mêr û gote te:

Tu gelek ciwanî. Tu gelek şirînî...

— Û te ji dil digot?

— erê ji nîva dilî.

— Û min çi bersiv da?

— Kenîya te ew bajêr li tana min îna. Çavên hemûyan li devê te ma.

— ez nemînim. Neku min dilê te hêla bit?!

— Ne ne, te hema dil bo min nehêla.Te bi sarîve got,eve bû te ez mehtil kirîm?Te divîya vê bibêjî?

Çeqçeqa şimka te ,ew kolan kire gorstan.

— ê ? Û paşî?

— ez li hîvîya te Mam, ka dê kengî dîsan êy.

— ez roja dî hatim. Mane?

— Dîtina te bû ew car. Tu li min berzebûy. Çend hewil min dan. Çend pirs min kirin. Min neşîya te bibînim.

— ecêbe tu jî wek gelek tolazan nedihatîye mala xesuwa min?!

— ez hatim. Bibore ,ez ji ber te hatim, ne ji ber pûçatîyan. Ji ber dîtina te.

— Çi digotine te?

— Digotin, ne li male, nesaxe .her car hêcetek digirtin.

— Kesê nedgot, te çi jê divêt?

— Kesê ageh ji kesê nebû. hindek pare dişên mirovî bikine ker!

— Bibore. Te çîroka min zanî. ez ji kuna xanî dernediketim.

— Xwezî min ageh ji te heba.

— Da çi kî?

— Da te revînim.

— Bibore min xemên te zêde kirbûn.

— ez dîn û har bûbum. ez li çu cihan ranedwestîyam.

Berê wê kete navçavên wî. Wêneyê xwe di çavên wî yên zîqra didît.

— heta rojekê min guh lêbûy. Gotin, Mirad û biçûkên xwe çoyne ji dervey welatî.

— her wekû ez wê rojê ji dayk bûym.

— Min jî her wê rojê pasportek kirî û karê xwe kir. Piştî deh pazde rojekan, ez gehiştim elmanîya.

— Jin û biçûkên te?

— ez ji ber wan revîbûm. Te divîya di gel xwe bînim!

— Pa çawa hatin?

— Piştî salekê ez li te gerîyam. Tu berzebûy. ez ji te bêhîvî bûm.

Rojekê babê min telefon kir û got, jina te û kurê te dê piştî du rojên dî gehne nik te.

— Wesa bi sanahî?

— Pareyekê mezin lê xeric kirbû. Vîza şênkil bo wergirtibû. Bi sanahî gehiştine dev min.

— evjî hatîye serê te?

— hêdî hêdî, min şîya xwe nêzîkî wê bikim. Bi taybet piştî kurek peyda bûy. Dilê min gelek pê disot. Min tu ji bîrkirî, dest bi jîyana xwe kir.

— Daxwaza lêborînê dikim. Min tu dîsan tûş kirî.

— heta hejarê malmîrat hatî û ew mizgînî gehandîye min. ez careka dî tûşî nexweşîya vîna te bûym.

— Bibore, min ageh ji te nebû. Tu bûbûye sîkotîn û ji min venedibûy.

— heker bi min bit. Dê xwe kime ristik û berdime nav van memkan, iha li vê derê.

ezmanê xwe di nîva memkên wê yên rûs gêran.

— Bela xwe ji min vebike .ez hest dikim, ez egerê malxirabkirina te me.

— erê. Çavên te egerin.

— Ne ne ,ez ji dil dibêjim. Min nevêt çu malan wêran bikim.

— Mal wêrankirina çi? Te ageh ji min nebû. ez eve çend sale li te digerim.

— Li destpêkê, demê tu dihatîye mala me, min gelek pê nexweş bû. Min hest dikir, tu ji ber Miradî diêy wek gelekan. Car jî min ji çavên te û awrîyên te bawrdikir. Min digot, ne ne ji ber min diêt. Wî ez divêm.

— Ji ber Miradî? Ma ez ciwanîya te nabînim heta bi dû nêrekî bikevim?!

— hindek mêr li mêran digerin. Me eve jî bi çavên xwe dît, hêşta em nemirîn.

— Û paşî çawa dilê te bi minive ma?

— Piştî wê şeva tu li mala me nivîstî û spêdeyê ez û tu bi tinê mayn û te qesta min kirî, ez gelek ji te tirsîyam, ez gelek ji te torebûm. Dilê min ji te sar bû. Min got, evê rweşenbîr û axivtin xweş. ewê min hizireka mezin bo dikir. ew jî êxsîrê binê xweye .ew jî nêre. Lê piştî te gotî, netirse ,ez çu karên ne bi dilê te nakim. ez nehatîme, te bitirsînim. ez hatîme harî te bikim û te xwe aqil kir û tu çoîye di jora xweve. Min zanî tu ne yê xirabyêy. Dilê min tena bû, min hest kir, êk heye divêt harî min bikit û başî telefonên te ez hêr kirim. Suhbetên te ez har kirim. heta te ez gehandîme xwe .hey gawrê bê dîn.

— ez gawrim yan tu?

— Tu ne bes gawirî, tu gawir û direwînî.

— Direwîn?!

— erê û mezntirîn direwîn.

— Dibit ez gawir bim, lê ez qet direwan nakim.

— Te direweka hindî dinîyayê kirîye. Te gote min, hişîyar be ,ez û tu nemînine bi tinê. heker ez dê te dime ber leqan û xwem.

Xwe havête ser kelexê wê û da ber leqan. Dengê wan, yarîyên wan, hemû tuxîb bezandin.

# Mêrê êkê

## Hemey zêringir

Dergehê turmbêlê ve kir, xwe havête der. Qesta nav wê darstana tarî kir. her wekû li tiştekî berze digerit.

Pişta xwe dayê. Destên xwe di bin kefşên xwera birin. Memkên xwe di navda veşartin. Da kes jêvenekit!

— eve te gelek caran, ev pirse ji min kir. Niza te çi merem pê heye?

Wî jî xwe ji turmbêlê havête der. Li pişt rawestîya, destên xwe havêtine navtenga wê, pişta wê bi sîngê xweve şidand.

— Tinê min divêt bizanim, ka wî pîremêrê bîs, çawa ev şêrejine kire bûk? ez qet bawernakim, bisanaey te xwe bi destve berdabit!

— ez her dibêjim. Tu zelamekê hîzî, ji çu têr nabî!

— Piştî du mêr û sê biçûkan, ez neşêm te razî bikim. Çawa wî xwelîserî tu razî kirî?!

Kenîya wê belgên daran hejandin û her zû bû xem.

— heker tu bizanî wê şevê çi hatîye serê min, heker tu rastîyê bizanî, dê bo min kîye girî, yan dê wî pîreseyî dîye ber demanceyan!

— ez ji te venabim, heta tu rastîyê nebêjî.

Li xwe zivirî. Kete beranberî çavên wî yên nêratî jê dibarit.

Wek xwandina raporteke dest pê kir:

— Hemey zêringir, mirovekê gelek zengîn ü xwedan mirove. Ji ber zikê wî yê mezin, bejna wî kurt dîyare. Mirov dişêt mûyên serê wî bihjmêrt. Du çavên biloq di serîda wek çavên beqa xûya dikin. Ji difina wî ya mezin xûyaye, ku mirovekê nêrekere. Lêvên wî her dem bêhna kebaban jê diêt.

Sê çar jin berdayne, bireka biçûkan hene. Jîyana wî, dinîya wî, tinê zik û binzkên wîye.

her jina ciwan, her kiça ciwan ço di dikana wî ya zêrîve û kete dilê wî, ew amadeye, malê xwe hemûyê bikite di pêsîra wêda.

Du sê gaveka ço paş.

— ez nizanim çawa ez dîtibûm?!

Berûkên birayê min tijîkirin. Babê min razî kir. Li ser bextê minê reş, ewê şevê birayê min, ez di gel cîranê me dîtim, hêceta wan xweş bû.

Divîya bêhna xwe vedit.

— ewa dî tu dizanî.

— ez ya giring nizanim.

Kenîya wê, dengê sêwîyan jê dihat.

— Tu rijdî tu bizanî?

— Ya mirin yan zanîn!

Pişta xwe dayê, berê wê kete bejna dareka bilind. hizira gîyanê wê ji wî cihî bilind kire ber esmanan, dûr ket, wek peykerekî xûya dikir.

Bejna xweya bilind, bi xemla bûkanîyê di joreka sarda dît. Di gel kêmbûna dengê dewatîyan, qutana dilê wê zêde bû. Ce şir bû, ronahî kizbûn.

Wek bîvelerzê, pênek li dergehî da. Qesta wê mêkewa hêşta ferx, kir. Bêy silav û destûrdan, çinglê wê girt, havête ser textî. Cilkên wê diberda dirandin. Wek gurgekê har û pirsî, kete ser kelexê wê. Da ber leqan, da ber maçan, alîst, givaşt, perxand, têkveda...

Li ser piştê, li ser zikî, li ser tenîştê, wek bûkeka patey, di nav destên biçûkekê şûmda çu nema lê nekirî.

ew gurgê har, li ser wî kelexê nazik bû jin. Nêratîya wî bû pate. Çav lê şorbûn. Nemêr bû. Çu jê nehat. Rabû serxwe, li nîva jorê çend carekan bi wî zikê mezin û wî kelexê rûsê pîs hat û ço. Gelek caran, ew leşê spî û nazik, alîst. Gelek caran bi wan dest û tilên zivir, ew gerden û ew hêkên kewan perxandin. Çu jê nehat. Neşîya çu bikit.

Dengê kuxka birazavay, xwîna dilê wî dibezand. Bi wê rûsatîyêve, dergeh vekir.

— Kes li van diran nemînit. em dê spêdeyê êk bibînin.

Tirsa wê zêde bû, kes li dora nema. Kes li tana wê naêt. Bi tinê di nav destên vî gurgê pîrda ma.

Baş dergeh girt. Careka dî li dor teniştên wê hate çepan.

Careka dî, li dor bejna zirav û pirça reş û çavên tijî kil û rondik zivirî.

— hey kiça seyî... ez rojê du sêyekên wekî te, di paşîya dikana xweda digêm. eve te çi li min kirîye? Çi li min hatîye?

hest bi serketinê kir. ew tirs, ew dirindatîya wî, li pêş çavan sist bû. Zanî neşêt çu bikit. Zanî çu pê çênabit. Zanî, dê bite pêtirankê hevalan. Dê bite pêlava wê. Zanî dê hizar hîvîyan jê bikit, heta harî bikit, heta ji vî deravî rizgar bikit.

Pitir xwe li ser textî tena kir, bi çavên tijî tirs, berê xwe dida zikê wî yê mezin. Di binda du gunên şor û pirteka goştê mirî dihejîyan.

Divîya pê bikenit, divîya yarîyan bi gunên wî bikit. Lê hêşta tirs li ser zal bû.

Çavên wî, bi çavên wê yên reş ketin. Zanî bûye pêtiranik. hest bi kêmasîyê kir. Zanî yarîyan bi gunên wî dikit. Zanî bi zikê wî dikenit. Mêranîyê xwe li serî da, bi her du destan simbêlên xwe badan. Serê xwe bilind kir, pencere baş kirtin, perde berdan, jor tarî kir, li hindav serî rawestîya.

— Tu dizanî ez ji vê jorê nacime der, heta te nekme jin, heta te ne gêm, heta vî parça patê li bin te tijî xwîn nekim! Tu vê çendê dizanî yan ne?

Berê xwe jê wergêra. Zanî çu jê naêt, zanî ketîye lepên xwe. Pitir xwe di nav lihêfa xweda kire qurmik.

— harî min bike. Da ez û tu ji vê ezabê derkevin. harî min bike, da ez ji vê şermzarîyê rizgar bibim.

hest bi serketinê kir. Pişta xwe dayê. herwekû qebê wî dixwast.

— ez dernakevim, heta nebme zava, evê baş bizane .ez dê çi bêjime hevalan?! ez ne ji nû tolazim! Tu ne kiça êkêy ez dikime jin.

Divîya hîvîyan jê bikit. Rû nedayê. Nedşîya berê xwe bidite binzikê wî yê mirî.

Li nîva jorê hat û ço, gelek caran destê xwe havête pêsîra xwe .hest bi çu tiştan nekir.

Dengê demjmêra bi dîwarîve, ser lê hêr kir. Çikçika wê, ji kuxka birazavay gelek nexweştir bû. hestê wî azirand. Kire gurgekê har, xwe havête ser kelexê wê yê rûs. Destên wê bi lêva textîve hişik girêdan. Pêyên wê, jêkvekirin, rûnişte ser ranên wê.

Destê xwe vekir, tila xwe ya şhedê kire di devê xweda, tijî ser tif kir, bi hemû hêza xwe, kire di nîva mitayê wêra.

Qêrîyên wê, guhên birazavay kunkirin. Tijî ser patê kiçînîya wê xwîn bû.

Bêhna wî hat. Tena bû, li ber tenişta wê rûnişt.

— iha te hosa divêt? Tu bûye bûk yan ne?

Tijî difina wê bêhna xwînê bû. Cirfek vê ket. hate ser hişên xwe. Li dor xwe zivirî, zava nedît. Recfka wê sist bû.

Qesta sîngê wî kir. Xwe di navda şidand. Têr kire girî.

— Te xêre dilê min? Te çi bû hosa dûr çoy? Bibore ,heker pirsa min hosa tu êşandibî. Tube bit, ez vê pirsê bikim.

Xwe pitir di nav sîngîda şidand, divîya sîngê wî kun bibit û di navda xwe veşêrt.

— Bigirî, têr bigirî. Girî çav û dilan ron dikin.

— Divêt tu bizanî ka çi hatîye serê min, da çu caran nebêjî ev jine ji bo pûçatîyê bi dû min ketîye. Baş bizane, tu mêrê êkêy, ji bilî helalên min, destê xwe kirîye min. Bawer bike ,hêşta min bi çavê xirabîyê sehnekirîye çu zelaman.

— ez bawer dikim. Xwe tore neke ,ez hemû tiştan dizanim.

— Divêt tu hemû tiştan ji jîyana min bizanî. Divêt tu bizanî ka ez çend rezîl bûyîme, da tu pitir hez ji min bikî, da tu çu caran, bi tinê, min nehêlî.

# Bêhnvedaneka kurt

— Dewat verevî. her kesek ço mala xwe. Mal valabû, ez bi tinê di wê jora ciwan û nexşandîve, di nav destên hemey zêringir da Mam.

Piştî şeva zavatîya wî, şerim dikir bête jora min. Çend şeveka ez bi tinê nivîstim. Bêhna min fireh bû. Keyfa min gelek hat. Min digot, xwezî bibite êşek heta heta jê sax nebit.

Çend şevek borîn, min tirs ji bîr kir, leşê min tena bû, ez bi hîvî ketim.

Şevekê, wek har û dîna hate jor, li hindav serê min rawestîya. Kire hewar û got:

— herwekû hosa bo te xweşe? Xwarin û vexwarin û nivîstin, tu ribîtebûy.

Dilê min tijî tirs kir. Berî ez baxivim, got:

— Dê hilo xwe rûs bike, da tola şeva zavatîya xwe li te vebikim.

Dilê min ji sîngê min derket. Min xwe asê kir, min kire hewar, min xwe vequta.

Kete ser sîngê min. ez bi zorî rûs kirim. Da me ber leqan. Lêvên min, hindî mêtin hişkkirin. Serê memkên min, ji mêtin ü leqdanê kulkirin!

Bawer bike, wê şevê çar pênc carekan, bi zorî di gel min nivîst.

Dîsan tirsê di nav dilê minda cihê xwe girt. Dîsan ez bûme carîye.

Spêdeyê berî derketinê, xwe têr dikir. Nêvro dihate mal, berî nanxwarinê carekê duwa li ser sîngê min diçerî. eve ji bilî şevên wî yên taybet.

Direngeşev, serxweş dihat. her li derî xwe rûs dikir, nedihêla ez cilkên xwe ji ber xwe bikim. Di ber minda didirandin.

Digot, eve jî xweşîyeke ,her tiştê bi zorî bit xweşe.

heta spêdeyê li ser kelexê min dikire şer, nedihêla ez binivim.

Digot, nenive. Min tu bo nivîstinê neînayî. Cilkên xwe neke ber xwe ,ez hêşta mayme .hêşta min çu nekirîye, dê nihu zivirme bejna te.

ez gelek di wî halîda Mam. Xwîn ji leşê min diza. ez hemû bûbûm birîn. Min jîyan nema.

Rojekê karek bo çêbû, çend rojekan ji mal dûrket.Li ber tenişta min rûnişt û got:

— ez dê du sê rojekan ji mal biçim. heta ez bêm dê birînên te sax bin.hişîyar be ji mal dernekevî.

Bi dengekê bilind kire kenî, hêşta kenîya wî tijî mejîyê mine.

ew sê çar roje, bûne sê çar çirke. Êvarîyekê hate mal. Berî her tiştekî, berî silav bikit, qesta min kir. Nehêla ez xwe dirêj bikim. hema ji pêyanve û bi cilikive, bêhna xwe îna. Qêrîyên min tijî guhên xwe kir. Bi serketinve got:

— eve tola şeva zavatîya mine.

ez wek mirîyan, ketme ser cihê xwe. Min got, başe ew westîyaye û bêhna xwe îna, ez dê ev şeve têr nivim.

Bi şev zivirî. Wek tolazekê çarde salî, li hindav serê min rawestîya, got:

— Tu dizanî êdî dilê min naçitê ez ji sîngîve bême nik te!

Destpêkê ez di merema wî negehiştim. Min nezanî wî divêt çi bibêjit.

Destê xwe li pêsîra min da û got:

— Vê derê bêtam bûye. Divêt ez li cihekî dî bigerim.

Bi hemû hêza xwe ez lê xwerîm. Min lê kire hewar û gotê, ew piştî mirina mine.

Bi hestekê sar, kenîyeka bilind, tijî hemû kun û qulaçkên jorê bû.

— Te divêt wek mirovan xwe aqil bike, te divêt wekî şeva bûkanîya te li te bikim?!

— Min got piştî mirina mine... Te zanî?

Pirça min girt, û got:

— ez ya bi dilê xwe dê bikim, tu jî ya bi dilê xwe bike.

Dîsan destên min bi lêva textîve girêdan û pêyên min jî wek wî vîyay, bi binê textîve girêdan.

Wek aşiqê peykerekê navdar, du sê caran li dor kelexê min zivirî. Ageh ji girî û hewarên min nebû.

Kemaxên min bi wan destên zivir perxandin, bi hemû hêza xwe ,ez kêşa me di koşa xweda.

Dengê mirinê ji min derket.ez bêhiş bûm. Min ageh ji çu nema.

Piştî demekî, ez hişîyar bûm. Wek gêj û serxweşan li min hatbû.

ew li ser lêva textî cigareya xwe dikêşa. Bi serê lêvan got:

— Bibore, min tu venekirî, hêşta ez mayîme .eve tinê bêhnvedan bû. Dibit ev şeve tu gelek wesa bimînî, da tu fêr bibî.

Careka dî, rabû ser xwe. Zikê wî yê mezin, neşîya wî koremarê di nav pêsîra wîra veşêrt.

ez ji dil tirsîyam. eve cara êkêye ez bi duristî dibînim. ev parçeye ne yê mirovaye. Beşeke ji nêratîya nêrekerekê hinşerî.

Min jinû zanî, ka ji bo çi hemey zêringir hinde jina dîînit û ka ji bo çi hîz û jinxwaze!

Li pişt min rawestîya, wek îzraylî, destên xwe havêtine kemaxên min, vê carê hêdî hêdî ez kêşame ber sîngê xwe, nîveka gîyanê min ço.

ez û ew û şev û roj... her gava wî vîyay.

Min jîyan nema. Bêhna min teng bû. ez gelek lawaz bûm. Leşê min hemû bû xwîn û birîn.

Min kes nîne hewara xwe bigehînimê. Kesê ageh ji min nîne .ez dê di vê jorêve bi kîrê hemey zêringir ême kuştin.

Şevekê, min birîyar da yan xwe yan wî bikujim!

Min got, heker min xwe kujit, eve êka dî kete tora wî. Divêt ez wî bikujim da jin jê tena bibin.

Min kêrek amade kir, dana di bin Balîfkê xwe.

Dîsan wek her car, li berdergehî, xwe rûs kir û got:

— ez dibêjim tu bi aqil ketî, tu fêrbûy. Dê xwe bo min rûs bikî û li cihê her car amade bî. Ma ne sîlava min?!

ew aqilê di serê minda ew jî nema. Min dest da kêrê û qesta meşka zikê wî kir.

Dîsan ji min bi hêztir bû. Kêr ji min stand û ez da me ber şeq û pênan.

— eve bi sanahî bi ser difina tera nabort. Kiça sey, we li te hatîye tu kêrê bo min rabikî?

Min gotê heker tu mêrî û xwedan şerefî dê min berdî. heker tu min bernedî. ez her dê te bikujim.

— Berî tu min bikujî. ez dê te bikujim. Lê ne bi kêrê, belkû bi vî kîrî.

— Min berde. Ma tu ji min têr nebûy?

— Belê, ez ji te têr bûm. Lê hosa bi sanahî ez te bernadim.

— ez amade me, bo her daxwazeka te hebit. Tinê min berde. Te ez kujtim. Tu nemirovî.

— Dê were bê ezmandirêjî. Were cihê her car. Xwe amade bike .ev şeve em nanivin. Dê heta spêdeyê heqê xwe ji te çêbikim. Spêdeyê telaqên te, dê kime nîva destê te.

Li ser milê xwe zivirî. hewar di nav hizirên xweda hêrbûye.

— Guhê te li mine ,eve seteke ez daxivim.

Bêy lê bizivirt, bi dengekê xemgîn.

— erê, bibêje. Min baş guh li teye.

— hewarê min, wê şevê ew nêreker, nenivîst. Leşê wî qet newestîya. Qet bêhna xwe venekir. herwekû hepik, dermanek xwarî. Nêratîya wî wesa dijwar bûbû, bawer bike wê şevê, ez nizanim çend caran hate nivîna min. Ji sîngîve, ji piştêve, çu reng neman nekirîn, çu şêwaz neman nekirîn.

Di gel bangê spêdeyê, destên min vekirin û got:

— Dê here hey kiça sey... Êk dû sê. her sê telaqên te ji min biçin. Dilê min xwe bi lez quta, min bawer nekir. Min dest da cilkên xwe da bikime ber xwe û birevim. Li min kire hewar:

— Dê çi bikî? ew cilik min bo te kirîne, tu nabî.

— Pa dê rûs biçim?!

heqê teye tu rûs biçî. Lê ji şerma dinîyayê, dê wan gustîrik û zincîran ji xwe veke. Dest da kirasekê kevnejnên xwe:

— ha eve jî ji te zêdeye.

Tu bawer dikî, min dest havête derpêkurtkê xwe, da bikime ber xwe, ji dest min înader û got:

— ev derpêkurtke, min bo te kirîye. Nabit tu bibî. hema hosa here. Ma çi pêve maîye tu jê bitirsî!

ez bi tenka kirasî û bê derpê ji mala wî derketim. hêşta dinîya tarî bû, got:

— Neçe ,heta ez serê xwe bişom û nivêja spêdeyê bikim. ez dê te di rêya xweda bigehînim.

ez ji derve, li ber dergehê hewşê Mam, heta nivêja xwe kirî. ez kirme di pişta turmbêla xweda, bi wî seruberîve, li ber dergehê mala babê min danam.

Min nedivîya kes min wesa bibînit.

Babê min ji nivêja spêdeyê dizivirî. Xwe havête dergehê turmbêla wî û gotê:

— Kerem bike qurban, were jor.

— ez naême jor. eve kiça te, da tu bo xwe careka dî bifiroşî. Lê vê carê bi nîv qîmet.

Kenîya wî û dengê çona turmbêla wî, ew kolan hemû hişîyar kir.

Babê min ji navçavên min û seruberê min, bersiva hemû pirsan zanî...

# Careka dî... Mêrekê dî

— Di mala babê xweda, ez bû me pîvazeka genî. Kesê pûte bi min nedikir. Kesê ez nediaxavtim. Şev û roj, wek girtîya di jora xweda, xwarin û vexwarina min, dayka min, bi dizîve bo min di îna jor.

Bab û birayên min, her şev, kom dibûn, pilan dadinan, rê durist dikirin, ji bo kujtina min, ka dê çawa min kujin. Bê ku kes di gerewa minda bête êşan.

hind ji şerma dinîyayê û hind jî ji tirsa girtinê, divîyan rêyekê bibînin min pê bikujin.

Car digotin, em dê sojin û dê bibêjin ku wê ji kerbên mêrê xweda xwe sot. Car digotin, em dê kine di bin turmbêlekêda û dê bibêjin qezaw qeder bû.

Dayka min, razî nedibû, pişta min digirt, digot:

— her tiştek li kiça min bêt, ez dê hewe tûş bikim. eve şaşîya hewe bû. hewe bi zorî da wî gawrî. hûn egerin. Divêt hûn bêne kujtin, ne ew.

ez di wî halîda Mam. Gelek caran min hîvî dikir, min bikujin. Lê kesê ew mêranî pê çê nebû.

Min hizir dikir, demê bab ü birayên min, min bi wî rengî bibînin, dê hemey zêringir dine ber demanceyên xwe.

Min nezanî, ew demance, tinê ji bo keşxeyê di ber şûtkên wanrane!

erê hewarê min, sê çar heyveka, ez di wî halîda Mam. Sê çar heyveka, ez di wê girtîxaneya, min bo xwe durst kirî da Mam. Min roj nedît, min mirov nedîtin.

Rojekê, Mamê min hate mala me, devê xwe bire bin guhê babê min û bû pistpsta wî. Piştî ji wê pistpstê xilas bûy, enîya babê min ya girê vebû, rûyên wî tijî bişkurîn bûn, çavên wî zîq bûn. ew çend heyv bûn, cihê ez lê, berê xwe nedidayê. Berê wî kete min, çavên wî mizgînîyek digehand. Destê xwe li milê Mamê min da û serê xwe bi razîbûnê hejand.

Destê xwe bilind kire dayka min. Daxwaza hatina wê kir. Dayka min xwe çemande berdevê wî. Wî jî pistpstek di bin guharên wêda kir.

Dayka min destên xwe bilind kirine bin zikê esmanî û lêvên xwe livandin, tijî navçavan hîvî bûn.

ez birime di jora xweve. Li ber tenişta min rûnişt û got:

— Kiça min, min soz dabû te ,ez te ji wî zikmeznî bidime berdan û te bidime êkî bi dilê te. Ma newe bû?

Serê min hêşta yê çemîyay bû. Axivtin ji min nedihat. her wê got:

— Mamê te dostekê gelek baş heye, wek em hemû dizanin û dinîyasin te guh li mine?

Min guh lê bû. Lê min xwe bêdeng kir. ez di merema wê gheştim.

— Mamê te dibêjit, dostê min, kurek gelek baş û xwandeva û aqil û di jîyê teda heye. Daxwaza xizmanîya me dikit, tu çi dibêjî?

Kurek tolaz û ciwan û xwînşirîn û...

— Min divêt vê carê tu razî bî. em te bi zorî nadinê. Te çi got?

Bi rastî hewar, dilê min, xwe zêde quta. Min hest kir, ez hêşta hejî jîyanê me. Min bawer nedikir, ez dê ême nav mirovan. ez li hîvîya kujtinê bûm.

Min neşîya çu bibêjim. Çu axivtin ji min nehatin. Dayka min têgehşt, ez razî me .her zû mizgînî da babê min.

Min neşîya çu bibêjim, ew kabira, dostê Mamê min bû. Gelek caran dihate mala wan. Mamê min diço mala wan. her bi başî behsê wan dikir.

Min hind dît, rojekê Mirad, di gel dayka xwe û babê xwe, li mala mene.

Seruberê wan yê xweşmirovan bû. ez nizanim çi bibêjim! Dibit min divîya ji wê girtîxaneyê û li hîvîya kujtina xwe rizgar bibim. Bi her rêya hebit. Bi her baceya hebit.

ez dirêj nakim, min xwe, bûk li mala Miradî dît, û ya dî tu baş dizanî.

— Ma tu pêveneçoy? Ma te pirsa wî nedikir?

— Da pirsa kê bikim?! Te halê min dizanî. Mamê min her bi başî û xweşmirovî behsê wan dikir.

— Niza çi bêjime te? Tu ne hejî vê hemûyê bûy.

— Ma ez çi bikim? Dîyare bextê min hoye. Min gelek caran digot, çawa tolazekê wek Mirad bi bi jineka wek min razî bibit? Min her digote dayka xwe, divêt hûn rastîya min bibêjinê da peşêman nebit. Dayka min digot, ew hemû tiştan dizanin û bawer nakin. Min nedzanî, li nav mirovên wî kes pê razî nabit. Kesê nevêt kiça xwe bikite di cobexaneyêda.

Min xwe gelek ragirt. Min gelek xwe asê kir. Min gelek bi çavên xwe dît.

heker ez nehatbam elmanîya, da niho kujtî bim, yan da serkêşa cobexaneyê bim.

Bibore, nuke tu dibêjî, ma eva tu di gel min dikî ne qehbetîye?

— Ne ne .ez we nabêjim. ez baş ya dilê te dizanim. ez baş dizanim tu bê xwedanî. Tu wek min bê hevalî.

— ez çu car razî nedibûm. Lê min jî mêr divêt. ez jî jinim wek her jinekê. Tu bawer dikî, eve gelek caran min got, heyvê carekê min Mirad di nav nivîna xweda neddît!

herdem kar û roja bê kar, di gel hevalên xwe heta nîv şev dima. Demê dihate mal, serxweş û westîyay, êkser pişta xwe dida min û dinivîst.

ez têrbûm. Min hind şîya, xwe ragirim, bi taybetî piştî tu di jîyana minda dîyar bûy û min merema te zanî, min halê te zanî. Tu jî wek min bûy. Min hest kir, te xirabîya min nevêt. Tu jî wek min bê xwedanî. Bê yar û jinî.

Bêdengîyê her du şir kirin. her êk di nav hizirên xweda, ço dinayayeka dî.

— Da bo te tiştekî bibêjim.

Serê xwe bilind kir. Xwe qulpande ser teniştê. Destê wê girt û da ber maçan.

— Bibêje, sîlava dilan.

Kenîyê ser ji axivtina wê stand.

— Ne ne. Tu dê bibêjî tu yarîyan dikî, yan dîn û harî, yan dê bibêjî tu ya serxweşî.

— hema bibêje. Ne tu dîn û harî û ne tu serxweşî. Te tinê du sê perdaxên bîrê vexwarîne .ez baş dizanim tu bi bîrê sexweş nabî... hema bibêje?!

— Ma bo?... Ma?

Dîsan kenîyê nehêla axivtina wê derkevit.

— Dê vêca bibêje. Te dilê min heland!

— Tu bi xwedêkî gelek bi min nekene û ji dil hizirê di vê suhbetêda bike.

— Dê bibêje, soz bit ez nekenim.

— Tu ji dil hez ji min dikî?

— ew çi gotine .erê pitir ji dilê xwe.

— Di ser wan hemû tiştên bi serê min hatîn û ewa tu ji min dizanî, her te ez divêm?

— Ma çi hatîye serê te ?her tiştê hatibite serê te, ji hêza te zêdetirbû, ne bi dilê te bû. erê ez ji ber wan tiştan pitir hez ji te dikim.

— Ma bo, ma bo ez û tu nabine malek?!

her zû lêvebû, tirsîya, ev daxwaza wê, barê wî giran bikit. Tirsîya jê birevit.

— Bibore, bibore. Ji bîr bike. Min çu negot.

Vê gotinê, hişên wî, ji nav kartêkirina wê bîra vexwarî cemandin, hişîyar kir.

— Te çi got?!

— Çunine. Min got ji bîr bike.

— Ne ne, bibêje. Min guh li tiştekî bû. ez neserxweşim.

hest bi kêmasîyê kir.

— erê, min got, em bo nabine malek? Madem te ez divêm û min tu divêy û tu ji ber teništa min naçî?

Devê wî beşbû. Çav lê hilî bûn.

— Tu jina xwe berde ,ez dê mêrê xwe berdim. em dê bine malek. Dê bine jin û mêrên bi duristî.

## Tu berde û ez dê berdim

Serê xwe ji nav destên xwe îna der. Dengê biçûkan, kenî û yarîyên wan, hizirên wî revandin.

Li ser milê xwe zivirî, wêneyê jina wî, bi xemla bûkanîyê li ber tenişta wî, tijî navçavan jîyane.

Li hindav serî, wêneyê wî di gel her sê biçûkan û dayka wan, di koka keyfêdane.

Dengê sîlavê di serîda deng vedida.

— Tu jina xwe berde ,ez jî dê mêrê xwe berdim.

Tezîlanik bi ser leşîda çone xwar.

— em dê bine malek, jin û mêr bi duristî.

— Jina xwe berde berde berde...

— Tu ji ber tenişta min naçî ... Tu ji mêrê min, pitir min dibînî. Tu ji wî pitir li nik min dinivî. erê... Jina xwe berde, da em pêkive bijîn.

Dengê qutana derguhê jorê, qutana dilê wî zêde kir. hewekû li benda sêdarê.

— Kîye?!

Dergeh vekir, tijî navçavan kenî û hîvîye.

— ezim. Ma ji bilî min, tu li hîvîya kêy bête di jora nivîstina meda?!

— Ne ne, lê!

— Lê çi? eve çend roje tu ji mal derneketî. Tu naçîye karî. Tu bêtibet bûy. Te xêre? Çi çêbûye?

— Çunine .ez nexweşim.

— Te çîye? Kîra te dièşit? Tu bo naçîye dixtorî?

— Divêt ez bêhna xwe vedim.

— Bila dilê min. Bêhna xwe vede. Xwe newestîne .em pêdivî tene.

— Kesê pirsa min ne kirîye?

— Belê.

Bilez nehêla axivtina xwe bi duristî bibêjit..

— Kê pirsa min kir?!

— hevalên te.

— Û kê dî?

— Tinê hindek hevalên te pirsa te kir. Netirse, min bersiva wan da.

— Te çi gotê?

— Min gotê nexweşe. Ma ne xweş bersiv bû?

— Mala te ava.

— Xwezî tu her hosa nexweş bî, da tu li mal bimînî, da em te têr bibînin.

Kenî, kenîya wî her zû bû hizir û dûr bir.

Li ber tenişta wî rûnişt.

— eve demekê gelek dirêje ,ez û tu, li vî demê rojê, di vê jorêve hosa bi tinê ne, rûniştîne. Tu bi şev diçoy û bi şev dihatî. Gelek şevan, tu li derê dinivîstî. ez dizanim karê te wesa dixwast. Me du sê rojan tu nedidîtî.

Berê xwe da navçavên wê, hêşta tijî hîvîne. Serê wê dana ser sîngê xwe û givaşt.

Dengê sîlavê di serîda, mejî lê dixwar.

— Jina xwe berde ,ez dê mêrê xwe kime der. em dê pêkve wek jin ü mêr jîn.

Berde... Berde... Tu ji ber tenişta min naçî...

Dergeh vebû. Kurê biçûk ji ber birayê xwe revî, bi kenîve xwe havête di nîva wanda.

ew nêçîra dayka wî dikir, ji dest da, her dû jêkvekirin.

Dayk bi lez bû, lê xwerî. her sê komkirine ber telefzyonê û dergeh lêgirt.

— Babê hewe nexweşe. Dengî nekin.

Bi lez qesta nêçîra xwe kir. Dergeh li pişt xwe girt. Xwe havête ser kelexê wî yê di nav hiziranda bûye êxsîr. Girêl kire ser textî.

— Tu evro ji nav destên min xilas nabî. Bila her tu nexweş bî. ez dixtora teme .ez derd ü dermanên te dizanim.

Sîngê xwe vekir. Serê memkên xwe nîşa çavên wî dan. Difina wî kire di nav memkên xwera û şidand.

— iha eve dermanê derdê teye.

Gelek lêvên wî di sîngê xwe hosîn. Pirça wî, bi tilên xwe, gelek şekir.

Ne serê memkên wê yên hêşta tijî jîyan, ne çavên wê yên tijî kil û ne pirça wê ya wekî şevê, ne bejna wê ya nêrgizan û ne hemû hewlên wê yên mê, şîyan dengê sîlavê û kenîya wê ji serê wî bînine der.

— Jina xwe berde ...em dê bine malek. ez dê mêrê xwe berdim. Tu jî jina xwe berde .em dê bi duristî bine jin û mêr.. Tu ji mêrê min, pitir li dev min dinivî...

Çend ya mê bû, çend xwe ciwankirbû. Xwe rûs kir, ew rûs kir. Gelek têkveda, gelek xwe wastand.

Neşîya wan girêkên enîya wî vekit. Neşîya mejîyê wî yê mijûl, hişîyar bikit.

Bi wan serudilanve, qesta jora xwarinê kir, di nav xem û kovanên wî yên giranda hêla.

— Jina xwe berde berde ...ez jina teme ,ez ji jina te pitir te dibînim. Tu ji ber tenişta min naçî...

Berde... Da pêkive bijîn. Berde... Jina xwe berde...

# Pêniç dînar

Xew jê sil bû. Nivînên wê yên nerim û paqij, bûne stirî û kevlê jîjî. Jora wê ya lêkday,bû gorê tarî.

Dîsan bi tinê ma. Kes xemên wê sist nakit. Kes di daxwazîyên wê nageht. Kes hest bi azarên wê nakit.

— Tu li kûvey? Te çi li min kir? ez neşêm bêy te bijîm. Dê li tana min were.

Dengê wê negehişte çu guhan.

— Min çi li te kir? Min çi gote te? Min divîya tu bo min bi tinê bî...

Li ser milê xwe zivirî, mêrê wê wek kelexekê mirar, di xeweka giranda, xirxira wîye.

Di ber tenişta wî, xwe dirêj kir, tenişta wî sar bû. Destê xwe di leşê wî gêra, çu nîşanên nêratîyê nedîtin.

Devê xwe bire nêzîkî devê wî, bêhina araq û votkayê jê difirî.

Gelek hewldan, gelek li ser kelexê wî bizav kir, neşîya girê mêyatîya xwe bikujit.

Çav lê tarî bûn. hest bi tinêyatîyê kir. Zanî dê dîsan mînte bi tinê, dê mînte bê xwedan. Kes tênagehit. Kes nizanit ka wê çi divêt.

— Tinê, te derdê min dizanî, hey gawir, were bizivire .ez peşêmanim. Min gû xwar...

Jor pitir tarî bû. Pitir bêdeng bû. Tirsîya, nevêt wek gelekan jina xwe bi sanahî bifiroşt. Zanî dê pêdivî mêrekî bit. Bê mêr naqetînit.

— hewar, ez çi bikim? eve çend sal bûn, ez di xweşîyeka taybetda dijîyam. Kesê ageh ji me nebû. Min çi kir? Min çi îna serê xwe ?her yê min bû. Min ji jina wî pitir didît. Çi dilreşî bû, min kirî?

Serê xwe dana ser Balîfkê nerim. Piştî ji wî kelexê bi rexve bêhîvî bûyî.

— helo.

— Belê? Keremke.

— eve mala Mirade?

— Belê ,tu kîy zehmet nebit? Tu sîlavî ma ne?

— Belê, ez sîlavim. Min nezanî tu kîy?

— Dengê te her wekî xweye. Tu nehatîye gihorîn.

— Supas. Ê...

— Niza ciwanîya te jî her ya carane?!

— Bawer neke. Mirov mezin dibit û xemên dinîyayê mirovî pîr dikin. Lê min nezanî...

— Lezê neke. Dê zanî ez kîme. Min divêt bizanim ka xemên dinîyayê hizirên te jî pîr kirîne.

— Dîyare tu baş me dinîyasî!

— Ji gîyanê xwe baştir.

— Te ez mereqdar kirim. heker tu nebêjî tu kîy, ez dê telefonê danim.

— Ne ne, bextê te da, tu dê wesa min kujî. Min divêt tu têr baxivî, min divêt dengê te tijî mejîyê min bit.

— Zû bibêje ,heker min dana.

